


Hêdî hêdî rojê xwe ji nava nivînan derxist, berê xwe da me, keniya û destê xwe dirêjî berîka xwe kir û nameyek derxist: "Ev nameya hevalekî ye. Ji nava şer, min ji te re aniye. Hevalekî gerîla şand. Min soz da wî ku, ezê nameyê bigihînim te", gote min. Û min bi heyecanekê, name ji destê hevalê xwe girt.

"Ev çend sal in ez li vê derê me. Di destekî min de tiving, di destê din de jî, tembûra min heye. Bi vê tembûra ku min ji hevalekî şehîd standiye, ez şevên moralê geş dikim. Li vir dengê min jî, ji berê xurtir bûye. Ne tenê li ser tembûrê, li ser tivingê jî ez hunermendekî baş im. Eger ku tu ne hunermendekî baş bî, tu nikarî şer bikî. Şer, hunereke bilind dixwaze."

Rûpel 8 - 9



Rojbaş heval!..

✓ **Rewşenbîrê kurd Dr. Sıraç Bilgin dilê xwe ji MARUF YILMAZ re vekir û li ser gelek mijaran axivî**


"Gava ku qala serxwebûna Kurdistanê dibû, axî ji dilê Abdullah Öcalan diçû" Rûpel 10 - 11

✓ **Girtiyên siyasî, li dijî Wezîrê Edaletê Mehmet Ağar di greva birçibûnê de ne, ev çalakiya wan dorfireh dibe û li derve jî malbatên girtiyan piştgiriya wan dikin. Nûçeya R. DILOVAN Rûpel 3**

✓ **Dîroka gelên bindest jî tê serûbinkirin. Nivîsa bi navê "Rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdî (2)" a**

MEHRDAD R. IZADY **ku li ser vê yekê disekine didome** Rûpel 4 - 5

NAVEROK




6

M. Ronak: 'Komeleyeke ziyandar:' Kürdistan Teali Cemiyeti



7

Metin Aksoy: Stran dengê şoreşê bilind dikin



13

Zana Farqînî: Dar mirovahî û kulîlkên wê ji qewm in

Ji Xwendevanan

EV demek bû ku rojnameya kurdî der-nediket, di jiyana me de valahiyek çê-bûbû. Lê bi derketina Azadiya Welat ev valahî hate dagirtin.

Divê mirov nebêjin "Ez bi kurdî nizanîm bixwînim." Kesê ku wê yekê bibêje, naxwaze dew ji rahetiya canê xwe berde. Kesê ku bi kurdî bizanibe û xwendina wî ya latîni jî hebe, ew mirov dikare bi kurdî bixwîne û binivîsîne.

Em wê yekê bi kurtî bibêjin zimanê kurdî ne zimanekî serbixwe ye, divê em li rojnameya xwe xwedî derkevin.


DOĞAN ŞEN/ SÊRT

DERKETINA rojnameya bi kurdî ji nû ve li ser navê Azadiya Welat li me hemûyan pîroz be. Em hêvîdar in ev rojname barê ku ji Welatê Me girt, bi rûmet û serfrazî hilgire û bi pêşdetir bibe.

Kesên ku xebata wan di vî karê pîroz de çêdibe, cihê wan li ser serê me ye û em ji wan re gelek spasdar in. Belê ez dikarim bibêjim ku Azadiya Welat di riya azadî û serxwebûna welat de çira-yeke gelekî geş û bişerefe.

Bêxwestin ez dawiyê li nameya xwe tînim. Dîsa silav û hurmetên germî, şoreşgerî pêşkêşî we tevan dikim.

M. CEWAD OĞUZ



Televîzyona gelekî bêdewlet: MED-TV

MEHMET GEMSİZ

Gele kurd di dawiya sedsala bîstan de gavinen bêhempa û tekane di-avêje. Bi xebat û têkoşîna xwe ya ji bo azadî û serxwebûnê, ji gelên bindest ên din re jî dibe nimûne. Avakirina televîzyona Medê, destkefteke mezin û girîng e.

Cara pêşîn gelê kurd, bêyî ku xwediyê desthilatekê be, televîzyoneke navneteweyî damezirand. Gava ku em baş bala xwe bidine warên wê yên weşanê, em dê wê yekê baştir bibînin. Ez ne şaş bim li 25 welatan dikare bi antenên peykê (satellite) bê temaşekirin. Digel wê, MED-TV bi zimanên ji hev cihê jî weşanê dike, wekî kurdî (sê zaravayên wê), tirkî, erebî, asûrî û hwd... Ji ber wê yekê, çendî ku televîzyon ji aliyê kurdan ve hatibe avakirin jî, êdî ev televîzyoneke navneteweyî ye.

Em ji nêrîn û ramanên dewleta tirk ên der barê MED-TV'yê de haydar in ku ji bo girtina wê bi çî awayî tê dikoşe.

Rola navgînên ragihandinê yên cema-

werî ku ewrûpî jê re Mass Media dibêjin, di warê hişyarkirin û agahdarkinê de zehf heye.

Îro kurdan di vî warê de çekeke girîng û bikêr bi dest xistiye. Ne tenê raya xwe ya giştî, her wiha ya cîhanê jî, ji rûdan û rastiyan haydar dikin. Hovîtiya ku dewleta tirk di vî şerê gemar û qirêjî de dike, talivê derdixe pêş çavên mirovan.

Bandora weşanên televîzyonan ji yên rojnameyan pirtir e. Ew hem xîtabî çav û hem jî xîtabî guh dikin. Girse û cema-wera ku lê temaşe dike ji yên rojnameyan zêdetir e. Ji aliyê din ve, temaşekirin jî xwendinê pir û pir hêsantir e.

Li hêla din, rayedarên dewleta tirk, çapemeniya wan û serekên îdarî yên cihî (mehelî) jî, dadixuyînin ku li Kurdistanê rêjeya temaşekirinê (rating) ya MED-TV'yê ji yên tirkan bêhtir e; her wiha li metropolan jî ev rewş heye.

MED-TV fonksiyoneke pir girîng tine cih. Di afirandina neteweya kurd de rol

levîze. Li hemû çîn û qadên civakî deng dike. Di nav wan de zimanekî yekgirtî çê-dike. Îro yekî/ê Culemergî û yekî/ê Meletî ji hev fêhm dikin. Soran û zaza, kurmanç û zaza, soran û kurmanç ji hev têdighên. Çandeke pişkdar (muşterek) di nav gel de şax berdide...

Ev rewş ji aliyê "rewşenbîrên tirk" ve jî tê dîtin û li serê dinivîsin, rayedarên dewleta xwe agahdar dikin...

Li vir daxwazên me jî, ji rayedarên TV'yê hene. Di warê zimên de hin bêhtir hesas bin baş e. Gerek e zimanekî sivik û sade bê bikaranîn. Heke naveroka bernameyan ne giran be, dê çêtir be.

Divê hay ji gramer, rastnivîs, alfabe û devokan hebin. Heta komîteyek bê avakirin û ew jî, ji van aliyan ve li ser bernameyan bisekine, tekstên wan kontrol bike. Eger komîteyêke wisa jî hebe, divê ji berê pirtir hewl bide xwe û li ser şaşî û kêmasiyan raweste.

Asta (mustewaya) temaşevanan, cema-wera hedef li ber çav bê dîtin, bername bi qalîtetir û naveroka wan xurt û balkêştir bibe dê zehf baş be.

Gerek e montajên bernameyan baştir çêbibin û ji yekê zêdetir kamera di kişandina bernameyan de bêne bikaranîn. Dîsa bernameyên sade pirtir tene temaşekirin.

Gulan aşmey şehîdan

Eger rastî bêro vatişî bi qey kurdan, bi qey Kurdistanî heme roc (roj), hefte û aşmî biyê roc (roj), hefte û aşmê şehîdan. Yanê bi vatişêkew bin sere hîrê sey û şeystî û panc rocî, pancas û di heftey û diyas aşmî bi qey ma kurdan û Kurdistanî biyê roc, hefte û aşmê şehîdan. Ena zî rastî ma û welatê ma wa. Bêguman hergû aşme taybetiyêkew xwi est a. Aşmey gulanî zî wahîrê taybetiyêka anahîn a.

Şehîdê ma wo verîn, şoreşger û enternasyonalîst Haki Karer hetê dewlete ro bi destê rêxistinêkew ajan, di gulanê 1977'na de, Entap (Dîlûk) de hame şehîdkerdişî. Bi şehadeta Haki Karerî, dewlete wast mesajêke bido. Çi bî eno mesaj?

Komey şoreşgeranê Kurdistanî biryar da bî ku, ro Kurdistan bibê vilay û karê xwi bikerê. Heval Haki enî biryarî ser ro yeno Entap, dest bi xebatey xwi keno. Di wextê kew kil de xebatêke başe keno. Xebatey ena grube bigîro û nêverdo raver şorê.

Serokatî grube eno mesajê dewlete baş teşhîs kerd û biryarêkew tarîxî girot. Xwi ra wate (mana) û girîngî enî şehadetî tiya de wo. Çi bî eno biryaro tarîxî? Wahîr ro şehîdan veciyayîş û berdewamkerdişê mucadelî bî. Eno biryar hame girotişî û gamêka pîl hamî eyştişî û partî hamî viraştişî. Viraştişê

Bi şehadeta 'çaran' neyarî di Zindanê Amedî de kerd vinî. Ancî şehadeta çaran mot ma ku şertî çî benê wa bibê, îrade û îdeolejiya xurt teslîm nêbena û serkewtîş munkun o. Biryarê xwi veyşnayışî tarîxî merdimatî de wahîrê cayêkew zehf girîngî yo.

ROBÎN REWŞEN

partî dewlete rê ciwab bî. Bi qey eno joy şehadetê Haki Karerî di tarîxê mucadeley ma de, wahîrê wateyêkew pîl o.

Dimay cûntay 12'ê rezberî senîn ma zanê dewlete miletey ma ser ro zilmêkew tarî û zelemat kerd, bi hezaran welatperwerî û şoreşgerî hamey girotişî. Zindanê Amedî de zilm û îşkenceyêka bêsinore şoreşgeran ser ro bibî. Dewleta waştêne (wastene) ku şoreşgeran teslîm bigîro û bi eno hawa dozey kurdan bino binîn ra bi qedêno û bikero gor û serê cê bêton bikero.


Di atmosferêkew anahîn de çar şoreşger û mîlîtanê PKK'î Ferhat Kurtay, Eşref Anyık, Mahmut Zengin û Necmi Önerî canê xwi kerd kiley

agirî û tarî û zelematê Zindanê Amedî bi agir û kiley canê xwi kerd vila, hewr û tarîtiya ku miletey ma ser ro bî kerde ra. Ma rê bî roşnayî rey û çimê ma kerdî a. Bi şehadeta 'çaran' neyarî di Zindanê Amedî de kerd vinî. Ancî şehadeta çaran mot ma ku şertî çî benê wa bibê, îrade û îdeolejiya xurt û zexme teslîm nêbena û serkewtîş (zafer) munkun o. Biryarê xwi veyşnayışî tarîxî merdimatî de wahîrê cayêkew zehf girîngî yo.


Di gulanê 1983'na de Mehmet Karasungur başûrê Kurdistanî de hame şehîdkerdişî. Şertê serkewtîşî Başûr de virazyay bî, partî ena rewşe dîbî û wastêne rey serkewtîşî akero. Çi heyf hêz û partî Başûrî Wahîrê siyaset û xeta çewte bî û eno îmkan dest ra remna. Çimê înan ro hesabanê qican bî.

Şehadeta M. Karasungurî Başûr de asasê joyîti neteweyî da a. Nika ma vînenê ku serkewtîş a çaxî bi dest nêkewtibo zî eyro hendî zehf dîr niyo. Ma eşkenê vacin ku rey serkewtîşî di Başûr de bi şehadeta M. Karasungurî bî a.

PKK'î hergû şehadet kerdo garanti rizgarkerdişê Kurdistanî. Eyro ma bi sereberzî vanê ku zey PKK'î û zey kurdan tu partî û milete qîmet nêdana şehîdanê xwi. La ma çîqa qîmet bidin şehîdanê xwi zî ancî ma binê deydane înan ra nêvecênê.



BERPIRSÉ ERNK'a Ewrûpayê yê berê ku ev du sal in li paytexta Îngilistanê girtî ye. Heftiya din (20'ê gulanê) derket pêşberî dadgehê ji bo ku îtîraza wî ya der barê fidekirina Almaniyayê de bê nixandî. Di dawiya danîşîna du rojan de, dadgeran diyar kir ku ewê biryara dawîn piştî mehekê êşkere bikin. Kani Yılmaz di 1994'an de li ser vexwendina mebûsên Îngilîz çûbû Îngilistanê û li wir hatibû girtin. Rojekê berî destpêkirina danîşînê li Hyden Parkê nêzî 2 hezar kurd û dostên kurdan berhev bûn û berdana Kani Yılmaz xwestin. Berpirseki Kurdistan Informationê ji radyoya BBC, beşa tirkî re diyar kir ku heta ji wan bê wê ji bo berdana Kani Yılmaz tê bikoşin.



DU HEYETÊN "Koma ji bo aşiyê em werin ba hev" heftiya din ji bo sê mamosteyên ku li Meraşê û du kesên ku li Sêrtê hatibû kuştin, çûn Kurdistanê. Heyetekê berê pêşîn ji walyê Meraşê û midûrê emniyeta Meraşê der barê kuştina 3 mamosteyan de agahî standin. Heyeta din ku ji Amedê dest bi xebatên xwe kiribû, çûn Sêrtê û ji bo du kesên ku li wir hatibûn kuştin bi walyê Sêrtê re axivîn. Li gorî agahiyên ku wan ji gundiyan standin, bi kuştina mamosteyan re tu eleqeya PKK nîn e, hêzên ku aşiyê naxwazin, ew bûyerê pêk anîne. Li hêla din du kesên ku 2'ê gulanê de li Sêrtê hatibûn kuştin ji karê MITê ye. Li aliyê din dewletê rê neda ku heyet derbasî başûrê Kurdistanê bibe.

NÛÇE

Ew avê dikolin!..

DIK

Gelo qasidê Mesut Almanya ye?

Ev serê çend mehan e ku PKK'ê agirbest îlan kiriye, lê ji ber ku dewleta tirk bersiva wê agirbestê nade û operasyonên xwe didomîne, aşîxwazên tirk û kurd ne bihêvî ne. Dîsa wekî agirbesta sala 1993'yan, dewlet êrîşên xwe yê herî mezin di dema agirbestê de dibin ser kurdan.

Di ser van êrîşan de, berî çendeyek ku li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê sûtikaste nesarfiraz çêbû, çawa ku ew bombe di rojêva aşîxwazan de teqiyabe, hêviya aşiyê bi çem de berdan. Lê, piştî ku Abdullah Öcalan got: "ji bo ku hemû kes bizanibin ku em aşiyê ji dil û can dixwazin, tevî sûtikastê jî wê agirbest bidome", dilê aşîxwazan hinekî germ bû. Û ev sûtikast ji aliyê hemû rêxistin û kesên aşîxwaz ve hat sermezkerin.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, li ser sûtikastê ji Tirkiye, Îsraîl û Amerîkayê daxuyani xwest. Piştî vê daxwazê ku serokwezîrê Tirkiyeyê Mesut Yılmaz çû Almanya, li ser pîrsa rojnamevanan bersiv da, got "Têkiliya dewlet û MIT'ê bi vê sûtikastê re tune ye."

Piştî Mesut Yılmaz, Konsolê Îsraîlê ê Tirkiye Zvi Elpeleg jî, di hevpeyvîneke ku roja çarşemê di rojnameya Demokrasiyê de çap bû de, li ser pîrsa "piştî sûtikastê, Öcalan ji Îsraîl, Tirkiye û Amerîkayê daxuyani xwestibû. Hûn li ser vê yekê dikarin çi bibêjin?" wî bersiva "Tu têkiliyên Îsraîlê bi vê bûyerê ve tune ye" dabû.

Çawa ku tê zanîn; çûna Mesut Yılmaz a Almanya bêhtir li ser pîrsgerîka kurdan bû. Beriya ku Mesut Yılmaz here, daxuyani da, got "Em dizanin ku tekiliyên Almanya bi PKK'ê re hene, ez dê ji wan re bibêjim bila ji PKK'ê re bibêjin da ku terore rawestîne." Wekî ku li holê agirbesteke PKK'ê nîn be û yê ku şer dimeşînin, êrîş dibine ser kurdan ne ew bi xwe bin...

RAHMÎ BATUR



Daxwaza wan çi ye? Qirkirina kurdan, vemirandina kurdayetiyê ye, çi ye? Lê bi tecrûbayên gerek e hîn bûbin ku di hepsan de, ne kurd tene qirkin, ne jî kurdayetî tê vemirandin...

Greva birçibûnê ku li Girtîgeha Amedê di 4'ê avrêlê de bi dorvegerî dest pê kiribû, ji 25'ê avrêlê bi vir de bi şeweyeke bêsinor didome.

Li aliyê din, ji bo ku Wezîrê Dadê Mehmet Ağar îstîfa bike û ji bo piştigiriya girtiyên Girtîgeha Amedê, li derve malbatên girtiyên û di hundir de jî girtiyên gelek hepsan dest bi greva birçibûnê kirin.

Piştî ku Gerinendeyê Ewlehiyê yê Giştî yê berê Mehmet Ağar bû Wezîrê Dadê, mafên ku girtiyên bi berxwedanên 15 salan bi dest xistibûn, hatin bînpêkirin. Dewlet hewl dide xwe ku têkiliyên navbera girtiyên û têkiliyên wan û derve ji hevtir bike. Ji bo vê yekê, careke din vekirina Girtîgeha Eskişehirê kete rojevê. Her wiha, rayedarên girtîgehan dest bi îşkence û lêdanê kirin, ji bo ku girtiyên bikin îtirafkar.

Di 4'ê avrêlê de ji bo protestokirina Mehmet Ağar û kirinên wî, girtiyên Girtî-

geha Amedê dest bi greva birçibûnê ya dorvegerî kirin. Ji ber ku kesî gazinên wan nebîr xwe û neheqîya li ser wan zêde kirin, girtiyên di 25'ê avrêlê de greva bi dorvegerî wergerandin ser greva bêsinor.

Ev 28 roj in ku greva birçibûnê ya bêsinor didome. Li gorî daxuyaniya girtiyên Girtîgeha Amedê, rewşa 25 girtiyên di grevê de giran bûye û ji van 25 kesan Taccettin Turan, Osman Önler, Mehmet Durson, Ahmet Tüneli, Musa Altun, Fesih Erkaplan, İbrahim Karalay, Ulaş Aslan û Nizamettin Karaağar hatine radeya mirinê. Lê wekî dewletê, çapemeniya tirkan jî li ser vê bûyerê, xwe li nedîtîne dafîne.

Li aliyê din, girtiyên gelek hepsan û malbatên girtiyên li bajarê Edene, Stenbol û Amedê ji bo piştigiriya girtiyên Girtîgeha Amedê û ji bo îstîfakirina Mehmet Ağar, dest bi greva birçibûnê kirin. Polîsan li Amedê dor HADEP'ê girtine, ji roja 19'ê gulanê ve nahêlin ku kes here ba malbatên girtiyên ên ku li HADEP'ê ketine greva birçibûniyê.

Av nayê kolan...

H e p s a Amedê piştî darbeya Kenan Evren, ji sala 1980'yan heta 85'an bûbû hê-

lîna êş û jana kurdan, goristana girtiyên wan... Ev hepsê hê jî di dilê kurdan de birîneke ragirtî ya bêderman e, ku nahêlin kew bigire...

Û dîsa vê birîne dikolin, dixwazin bêhtir kûr bikin. Dîsa xwîne dixwazin, dîsa can dixwazin...

Daxwaza wan çi ye? Qirkirina kurdan, vemirandina kurdayetiyê ye, çi ye? Lê bi tecrûbeyan gerek e hîn bûbin ku di hepsan de, ne kurd tene qirkin, ne jî kurdayetî tê vemirandin... Bi mirina çar-pênc girtiyên kurdayetî venamire, kurd xelas nabin.

Ew avê dikolin!.. Av nayê kolan...

Bêrê li Çiyayê Agiriyê kurdayetî bînerd, na, ne bînerd, binbeton kirin, çenebû... Piştî heştêyan, di Hepsa Amedê de ceribandin, di bin lehiya PKK'ê de man... Dîsa dixwazin li Hepsa Amedê biceribînin, îcar ku di vê daxwaza xwe de bi îsrar bin, wê di bin çî tofanî de bimînin, kes niha pê nizane...

R. DILOVAN



Mehmet Ağar

Hepsên ku girtiyên ji bo piştigiriya girtiyên hepsa Amedê û ji bo îstîfakirina Wezîrê Dadê Mehmet Ağar, ketine greva birçibûnê ev in: Entab, Bismil, Mêrdîn, Pêşerî (Qubîn), Semsûr (Adiyaman) Ruha (Urfa), Buca, Sakarya, Çankırı, Gebze, Bartın, Enqere, Ümraniye.

Rewşa îroyîn a

dîroknivîsîna kurdî (2)

Di vê demê de ku kurdên li jiyane, mecbûr tên hiştin da ku kurdûna xwe îsbat bikin, wê çawa zanyar û dîroknivîsîna sereke yê hezar û sed sal berî niha wekî kurd bê binavkirin? Abû Hanîfa Dînawarî bi erebî nivîsiye û misilman bûye, lewma divê bibe ereb û ji qewmê ereban be, li gorî mantiqê bêhempa yê nivîskarên çapa nû ya Ansîklopediya Îslamê.

MEHRDAD R. IZADY

Dema rastiye cografi û botanîk nikaribin tişteki bikin, ma guleyên kevirkanê karin çi bikin ji bo guhartina kevneşopî dîroki? Kalikên kurdan hûrî, çawa karin doza rûmetê bikin li ser tiştên ku ji warê wan hatine derxistin, bêyî rakirina bend û sînorên (wekî G. Wilhelm bi mafdarî jê re dibêje) vê senifandina spekulatîf.

Di berfanbara 1994'an de Dr. Virginia Badlerê li Komeleya Antropolojîk gotarek pêşkêş kir. Dr. Badler li Zanîngeha Torontoyê mamoste ye û niha serokatîyê ji heyeta kolandina li Godîne re dike. Tevî vê yekê jî, wê di gotara xwe de dixwest, bi veşartina delîlên fîzîkî yê ku tezên wê pûç dikin, statukoyê biparêze. Her wiha bidestketina guleyên kevirkanê wekî delîl nîşan dida, îdia dikir ku şerab û bîra îcadên sumerîyan in. Ji bo ku mazereta xwe ya diyar xurtir bike, ew dibêje: "Wê demê guleyên kevirkanê yê ji gilke, ambûrên şer in." (Science News, 146, 1994, 390). Em bi tu awayî nayên agahdarkirin li ser qewmîyeta leşkerên ku ew gule bi kar anîne û 5500 salî berî niha ew depo kirine, li cihê ku niha fiçiyên bîra û şeraba herî kevin hatiye dîtin.

Heke di dîrokê de keviravêjên herî navdar kurtî/kurd bin; ceh û tîrî berê çiyayên kurdan bin û cara yekemîn li wir ber dabin; û heke Godîna ku ev destkeftiyên belgeyî lê hatine dîtin, li çiyayên kurdan be, çawa dibe, encama ku Dr. Balder diyar dike yanê "şerab û bîra îcadên sumerîyan in" rast dibe? Ji ber ku Godîna ne di nav sînorên Kurdistanê serbixwe de ye û akademiyeke kurdî ku li dijî wê gotinê derkeve nîn e, wê ev encama ku Dr. Badler diyar dike, bikeve nav kana kevneşopî dîroki ku hê jî rê li ber kalikên kurdan hûriyan digire da ku ew bibin xwedî rûmet ji ber tiştên ku wan xistine kana mirovahiyê. Çi tiştên ku bi belgeyan eşkere bûne, çî jî yê ku wê di ayandeyê de derkevin holê.

Liberxwedana lêkolînerên dîroka dema pêşîn a ji bo rûmetnedana hûriyan (li ser rola wan a di perisandin û dewlemendkirina şaristaniya Rojhilata Navîn û Behra Spî), dibe sedema nedîtina pêwistiya avakirin û pêşvebirina dîroka kurdan a mayî jî; yanê dîroka ji dema hûriyan heta destpêka sedsala 20'an. Di her du rewşan de jî arîşe ne kêmtî û alozbûna materyalên çavkaniyê ye. Tiştê ku dibe sedema vê rewşê, bi gotina pêşiyar, tîrsa vekirina qutiya Pandorayê ye. Vê yekê dema di warê hûriyan de dest pê kir, wê pêdiviya guhartina gelek tekstên standart ên îroyîn û rêza bûyerên li ser dîrok û perisîna çanda Rojhilata Navîn û Behra Spî derxe holê. Her wiha senifandina ji nû ve li gorî bikiran jî wê pêwîst bibe.

Ger mirov sînorên ku bi senifandina spekulatîf derketine holê deyne aliyekî, gelo kurdan tu alikariyên ku hêjayî bidestxistin û daxuyandinê bin, gihan-

dina şaristaniya herêmê? Ji bo bersiva vê pirsê em careke din, bidin ser riya mantiqê ya sar. Bi xêra cihê navendî ku li Rojhilata Navîn a mezin girtine be jî, divê alikariya kurdan di radeyeke bilind de çêbûbe. Lewre ew cih, warê şaristaniya domdar a herî kevnar e. Îcar, piştî vê encama mantiqî, mirov kare çawa, rastiya diyar ku niha li ser navê kurdan li tu muzeyên arkeolojîk ên cihanê firaqek jî nayê pêşandan, şîrove bike? Şîroveya vê yekê gelekî hêsan e; tişt bi zanatî li ser navên çewt tene nasandî. Ew yek bi teyî jî bo firaqan jî nayê kirin. Bi destûra we ez mîna keke din bidim.


Ji bo edîtorên Ansîklopediya Îslamê hemû misilman kurd in!

Îsal, 1100 saliya yek ji zanyarên herî mezin a dîroka kurdan û şaristaniya îslamî Abû Hanîfa Dînawarî ye. Di çapa yekemîn a Ansîklopediya Îslamê de ku sala 1913'yan derket, Abû Hanîfa Dînawarî ji aliyê C. Brockelmann ve wiha hatiye nasandin: "Zanyar û zîmanzanê erebî." Peyva erebî di zîmanê akademîk de ji bo kesên ku xebatên xwe bi zîmanê erebî kirine, lewre jî malê kevneşopî zîmanê erebî ne, tê bi kar anîn.

Ev tişt dişibe vê yekê, wekî ku mirov rabe, hemû kesên ku nivîsên xwe bi îngilîzî dinivîsin, bike îngilîz û paşê jî hêvî bike ku wê xwendevan guhê xwe nedin wateya neteweyî û etnîkî ya di nava vê tîgînê de. Di rastiya xwe de her wekî niha tê dîtin, tevîhevkirina her du tiştan, ji tîrsê û nezanîne pirtir, tercîh e.

Di destpêka sedsala 20'an de dest bi nivîsandina dîrokên qewmî yê cur bi cur bû. Komên qewmî dengê xwe bilind kirin, ji bo zefkirina her tiştê ku karin bikin mal ji dîrok û mîrateya xwe ya biqîmet re. Ansîklopedî bi tenê alikariya vê pêvajoyê dike. Ew zîmanê tevlihev a ku di çapa yekemîn de ku ji bo danasîna Abû Hanîfa Dînawarî hatibû bikaranîn, di çapa duyemîn a sala 1968'an de xuya nake. B. Lewin di vê çapa nû de wiha dest bi danasîna Abû Hanîfa Dînawarî dike: "Zanyarê ereb ê sedsala 3 û 9'an." Ew, vê dazanîna eşkere ya li ser koka wî ya qewmî dike, tevî agahiyên ku ew bi xwe dide, li ser kevneşopî şexsiyeta xurt a îranî û daxuyaniyên hestî yê di xebatên Abû Hanîfa Dînawarî de. Dîsa ew diyar dike ku ji van daxuyaniyan hêjahiya Abû Hanîfa Dînawarî di çavê derdorên ereban de kêmtî bûye. Her wiha, Lewin bi xwe dibêje ku di nav kalikên Abû Hanîfa de kesî ereb tune bûye, bapîrê wî Wanand ne misilman bûye û Abû Hanîfa li Dinawara başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê û li wir jî miriye. Tevî ku ew, van gişkan dizane û vedibêje, jê re sosret nayê ku bi van gotinên bêşermîn, dest bi gotara xwe bike û bibêje: "Zanyarê ereb ê sedsalên 3 û 9'an."

Ev çewtiya eşkere ya li ser nasnavê zanyar ji aliyê



Ehemêdê Xanî

edîtorên Ansîklopediya Îslamê ve nayê redkirin, ji ber ku li gorî wan heta berevajî bê îsbatkirin, hemû misilman ereb in. Bi awayekî siruştî, dil dixwaze ji amadekarên ansîklopediyeke ku li Holandayê tê çapkirin hêvî bike ku gelemşeya netewetiya kesê ku dixin nava ansîklopediyê wekî mijareke girîng nebînin li hemberî payebilindiya zanyar û li derveyî ansîklopediyê bihêlin. Lê heke ew wekî tişteki girîng tê dîtin, mirov hêvî dike ku bi giştî girêdahî rastiye bimînin û bi alînegirî vî aliyê zanyar rohnî bikin. Di nav bi hezaran rûpelên ansîklopediyê de zanyarek jî li ser navên kurdan nehatiye nivîsîn û birek zanyarên ne-ereb li ser navê ereban hatine nivîsandîn. Ev rastî nîşan dide ku mijara netewetiye ji bo nivîskarên ansîklopediyê ne tişteki ji rêzê ye û qewmê ku wan tercîh kiriyê ereb in. Wekî karê zarokan xuya dike, lê ev yek rast e.

Ji ber ku parek ji bo kurdan ji kelepora hevpar a çandî û dîroka Rojhilata Navîn nehatiye veqetandin, amadekarên ansîklopediyê jî wekî gelek nivîskarên nûjen naswazin tişteki ku kurdan doza wê nekiriye, bidin wan. Ma wê ji bo çî keştiya statukoyê bihejînin, heke kesên ku ji vê bazarê zirarê dibînin, serê xwe xistibin binê qûmê? Di vê demê de ku kurdên li jiyane mecbûr tên hiştin da ku kurdûna xwe îsbat bikin, wê çawa zanyar û dîroknivîsîna sereke yê hezar û sed sal berî niha wekî kurd bê binavkirin? Abû Hanîfa Dînawarî bi erebî nivîsiye û misilman bûye, lewma divê bibe ereb û ji qewmê ereban be, li gorî mantiqê bêhempa yê nivîskarên çapa nû ya Ansîklopediya Îslamê.

Navdariya Evliya Çelebi û rewşa Abû Hanîfa Dînawarî

Werin em beramberî girîngiya Abû Hanîfa Dînawarî kêmnawdana wî, bi navdariya Evliya Çelebiyê ku ne zêde girîng e re, muqayese bikin. Vê demê belkî mirov mekanîzmeya nepixandinê ya serbilindiya ji

ber çand û dîroka neteweyî, nas bike.

Evliya Çelebiyê sedsala 17'an ku di temami jiyana xwe de, karibûye hin rojenivîskên gelek baş binivîse, niha wekî pêşengê zanyarên cihanê tê pêşkêşkirin. Ev yek bi xebatên Enqereyê, (yên wekî hempayên wê yê li Amerîka û Ewrûpayê), pêk hat. Her parçeyê rojenivîskên wî bûn warê lêkolîn, werger û şiroveyên dirêj ên lêkolînerên jîr ku ji aliyê qelîteyê ve mirov nikare bide ber rojenivîskên bi rengê "ez çûm, min dît û min nivîsand" û li ser kaxizên pir xweşik hatin çapkirin. Wekî ku ev tişt têrê nekin, îcar zanîngeheke mezin a Amerîkayê beşeke taybet diyarî Evliya Çelebî kir.

Her mirôvê ku hez ji zanyariyê dike, divê bi rûmeta ku ji bo gerokekî hêja tê nîşandayîn, kêfxweş bike. Lê dil dixwaze ku eleqeyê mezintir ji bo zanyarekî wekî Abû Hanîfa Dînawarî bîrbir û dûrbîn bê nîşandayîn.

Lê mixabin tiştêkî wisa xuya nake. Ji ber çî? Ji ber ku tu peywendîya wê rûmet û pesindayîna ji bo Evliya Çelebî, bi serkeftinên wî re tune ye. Evliya Çelebî ji ber ku malê çand û dîroka gelê tirk e, ew jî wekî gel, çand û dîroka tirkan, di nav rêza pêşîn a zanyaran de hatiye çîhkirin, li gorî wê jî eleqeyê dibîne.

Abû Hanîfa Dînawarî yê ku yek ji zanyarên herî ronak a şaristaniya îslamê û cihanê ye di 1100 saliya xwe de, di nava mij û dûmanê de dimîne, ji ber ku ew ji neteweyê bîndest ango ji kurdan e û ew neteweyê bi destê spekulatoran ji aliyê girîngiyê ve li rêza paşîn hatiye nîşandayîn.

Kurd zanyaran dihêlin, diçin pesna xwe bi serokeşîran didin

Ev meyla kêmrûmetdayîne ji bo rola kurdan a di dîrokê de, bandora xwe li kurdên dema nû jî dike. Ev rast e, hewla guherîna wê rewşê jî ne zehf e. Helbet hin sedemên ve yekê hene, wekî nebûna perwerdehi-

ya li ser babetên têkildarî kurdan. Kurd, bi tekstên ku destkirên wezaretên hikûmetên herêmê yên bi şeweyê politik û ji aliyê dîrokê ve tîmarkirî, tî hêvotîn. Armanca amadekirina van pirtûkan ev e: Divê ew rîya xwendaran bi tu nîşanên pêzanînen li ser raborî û



Şerefxanê Bidlîşî

dema têdeyî ya kurdan nexin. Zarokên kurd bi pesindayînen ihtîşama Sîrûsê (Cyrus) farisan, Ertuğrulê osmaniyan û Cemal Abdûl Nasîrê ereban digihîjin. Di vê pêvajoyê de ew jî pir-hindik, şewq û daxwazêke bi qasî ya ereb, faris û tirkan nîşan didin. Lewre ew jî di bin tîmara eynî bîrdozê re derbas dibin, heman (eynî) pirtûkên dersê dixwînin, heman weşanan tema-

şe û guhdarî dikin û di ber heman billboardên propagandayê re derbas dibin. Wê ji bo çî ew jî heman xîret û daxwazê nîşan nedin. Dema Ansiklopediya Îslamê ya navmezin bêpaxav û bi şeweyê zelal bide zanîn ku Abû Hanîfa Dînawarî ereb e, em pîrozkirina salvegera wî deynin aliyekî, çima kurdek bixwaze ku wî nas bike? Hê ansiklopediyê kurdan ku were wî rizgar bike jî nîn e.

Kurdên ku wekî şagirt (xwendekar) derfeta hînbûna dîrok û mîrateya xwe li dibistanan bi dest nexistine, ji bo pêkanî û zeximkirina hestên xwe yê welatperweriyê (yên di bin tehdîtan de), ji xwe re çend şexsiyetên siyasî neqandine. Rewşenbîrên nûjen ên kurd êdî hatine ve radeyê ku serbilindîya mezin a ku karin di hezkirina Abû Hanîfa Dînawarî de bi mafdarî zêft bikin, dihêlin û diherin pesna xwe bi hin şexsiyetên politik û serokeşîrên wekî "Simkoyê Mirov-xwer" didin. Dema kurdan jî karibûna eleqeya ku tirk nîşanî Evliya Çelebî didin, nîşanî Abû Hanîfa Dînawarî bidin, wê lehengê kurdan ê neteweyî ku li cihanê jî di rêza pêşîn de ye, derkeve holê.


Her wiha, Abû Hanîfa Dînawarî wê bi tenê jî nemîne. Her sala nû hin salvegerên jîyan û serkeftinên rewşenbîr û naydarên kevnare yê kurdan nîşan dide. Sala çûyî 300 saliya nivîsandina destana neteweyî Mem û Zîna Ehmedê Xanî bû. Îsal 1100 saliya Abû Hanîfa Dînawarî ye, sala 1997'an 400 saliya nivîsandina Şerefnameyê ye. Ev berhema ku bi destê Şerefxanê Bedlîsî hatiye nivîsandin, yekemîn pirtûk e ku li ser dîroka kurdan a qewmî ye. Her wiha sala 1998'an 1800 saliya Lucian e ku ew jî yek ji mezintirîn epîstemologîst, (agahînas), hostayê xweşpeyvîne (rhetorician), wêjevanê nivîsên şerecûnî yanê satîrîstê çîhana greko-romen e.

Dûmahîk heye

Wergera ji îngilîzî: SAMÎ BERBANG

Çend gotin li ser hêza çaremîn (1)

MAZHAR GÜNBAT



Rojnamegerî çî ye, em bi çî çavî lê dinêrin? Çî ne taybetiyên çapemeniya bitesîr ku yek ji hêzên sereke ye di nav hêzên desthilatdar ên cihanê de? Hêz û tesîra rojnamegeriya me çîqas e, eger ne bi dilê me be, çî ne sebebên wê?

Eger tarîfêk ji bo vî karî bê kirin, bi awayekî giştî û kurt wekî karê ragihandin, bi şeweyekî îndîrekt perwerdekirin û wekî armanç jî, li gorî xwe guhartin û heta di maneyekê de jî wekî manipulekirin dikare bê tarîfkirin.

Dîroka karê rojnamegeriyê, eger bi ya gelek meslekên din re bê muqayesekirin, zêde ne kevn e. Her çîqas, hê ji beriya mîladê ve û bi taybetî jî li Roma û hin welatên din, belavok û daxuyaniyên agahdarkirinê yê ku bi taqên (dîwarên) avahiyên resmî ve datanîn, wekî cureyên rojnameyan tî qebûlkirin jî, di maneya meslekî de û bi sistemeke nûjen, bi pêşkêşîna navgînên ragihandin û teknîka çapê, ber bi sedsala 17'an ve, ev meslek xwe

didamezirîne û pêl dide.

Cara pêşîn di 1605'an de, li Anversê rojnameyêke 15 rojî Wettliyeke Tiddinghe bi fransî û flamanî derket. Beriya ve jî gelek weşan hatibûn çapkirin, lê ev a yekemîn a periyodîk bû. Di pey ve re, di 1609'an de, li Strasbourg û Ausbourgê rojnameyên hefteyî derketin piyaseyê, piştî 1615'an, li Frankfurtê gelek rojnameyên periyodîk dest bi weşanên kirin û piştî demeke din, weşanê rojane bi rîk û pêk li raya giştî ya lokal belav bûn. Di dawîya sedsala 19'an de rojnameyên ku li hemû cihanê dihatin belavkirin, xuya bûn.

Rojnamegerî, ji ber hin pêdiviyên civakî, bazîrganî, hinek jî edebî û zanistî dest pê dike, bes bi pêşveçûna teknolojiyê derfet û teknîkên wê, pir zêde dibin û tesîrê li jiyana civakê dike, civakê jî pêşveçûnên her warî haydar dike, agahî û zanînen gelek waran ji bin kontrola çîneke bijarte dertîne. Piştî demeke din, tesîra wê ji rola wê ya meslekî û ji çarçoveya armanca hebûna wê dibore û dibe mîna hêzeke siyasî.

Wisa dibe ku, êdî di hêla siyasî de jî dike ku nêrîn û ramanên mirovan û pê re jî yê kom û civakan biguherin. Piştî ku ev tesîra wê wisa zehf dibe û dibe xwedî roleke mezin di guhartina dîtin û awira raya giştî de, serdestên civakê hêdî hêdî dest diavêjin vî karî û hêza wê hin mezintir

dikin. Di nav her welatê ku bi sistema cumhûrî tê îdarekirin de, rojnamegerî li pey hêzên qanûnçêkirin, birêvebirin û darizîne, dibe hêza çaremîn. Li ser rûyê cihanê tu meslekê civakî an jî rewşenbîrî jî xeynî çapemeniyê, di ve maneyê de nebûye hêz. Girîngî û rola meslekê herî pêşkêşî jî, bi yê rojnamegeriyê re nikarin bîn muqayesekirin.

Her ku teknoloji bi pêş ve çûye, tesîra vî warî zêde bûye, bi beramberî zêdebûna tesîra rojnamegeriyê, desthilatdarên siyasî û dewlemendan jî kontrola xwe li serê zêde kirine.

Di dawîya sedsala 19'an de ew mîna hêza çaremîn hatiye binavkirin. Îro êdî tê gotin ku ew jî rêza çaremîn ber bi jor ve hilkişiyaye, ango bûye hêza duyemîn an jî yekemîn. Bi awayekî fermî û hiqûqî nebe jî, bi awayekî objektîf wisa ye.

Têbînî: *Ji beqê binê bîrê pîrsîne ka dinya çîqas fireh e, bi zîmanê maran bersiv daye û gotiye: Dinya bi qasî devê bîrê fireh e. Rojnameya Ronahî ya ku ji sedî heştêyî wê tirkî ye, lê ji xwe re dibêje rojnameya kurdî, ve heftiyê bi saya nivîseke Edîp Polat meseleya beqê anî bîra me. Birêz Edîp Polat di quncikê xwe de wiha gotiye: "Niha yegane rojnameya kurd a ku li Tirkiyeyê tê weşandin, Ronahî ye."*

Têbîniyêke din: *Vî ciwamêrî ev nivîsa xwe jî bi tirkî nivîsandiye.*

'Komeleyeke ziyandar':

Kurdistan Tealî Cemiyeti

Komara tirk di 19'ê gulanê de "Cejna 19'ê Gulanê" pîroz kir û destpêka "Têkoşîna Rizgariya Neteweyî" bi çûna M. Kemal a Samsûnê didin destpêkirin. Îro roja çûna wî wekî cejnê pîroz dikin. Dîroka fermî napejirîna ku Sultan Wehdetîn yawerê xwe şandîye Samsûnê. Lê îro ev yek, çiqas bê nixumandin jî, ji aliyê hejmareke girîng ve tê qebûlkirin.

Îcar çî dema ku "19'ê Gulanê" tê pîrozkirin, giregirên dewletê, ji serkomar bigirin heta bi rayedar û karbidestên biçûk; behsa demên-beriya 19'ê gulana 1919'an dikin û dibêjin ku dewleta osmanî ji hêla dijminan ve hatibû vegirtin (îşgalkirin), tirkîti dixweste bê tunekirin û hwd.

Her wiha ev rayedar bi van daxuyaniyan jî qîma xwe naynin û ji "Zeararî Cemiyetler"an jî behs dikin. Ji ciwan û gel dixwazin ku bi hemû hebûn û nebûna xwe li welatê tirkî xwedî derkevin, li hemberî neyarên der û hundirîn hişyar bin, serî hildin û bi rêxistin û komeleyên ziyandar û "xêrnexwaz" re tê bikoşin.

Bi vê mebestê, behskirina ji "komeleyeke ziyandar" li ser me ferz bû. Di dema me de û niha jî, piştî dibistana seretayî, di dibistana navîn û amadeyî (lîseyê) de û di unîversîteyan de ji "komeleyên ziyandar" tê behskirin, ku yek ji wan navê wê "Kürdistan Tealî Cemiyeti (Komeleya Bilindkirina Kurdistanê) ye.

Gava ku mamoste li ser vê komeleyê disekin û bi nexweşî jê dipeyivî, kizîni jî dilê min diçû. Me nikaribû ew komele biparasta jî. Lewre, der barê wê de me tiştê nedizaniyê.

Me dê çawa bizanibûya? Li Farqînê mîna gelek zarokan, çaxa me dest bi xwendinê kir, me herfek jî bi tirkî nizanibû. Di gel hînbûna xwendin û nivîsînê, em zimanê tirkî jî hîn dibûn. Rewşa me jî ya kesên ku bi tirkî dizanibûn xerabtir bû. Heta dawîya dibistana seretayî, me bi zorê dikaribû çend peyvên tirkî bianîna ba hev û pê xeber bidana.

Em şagirt, suxteyên ku bi çanda kurdî rabûbûn û bi xebereşkên Rostemê Zal, Mîrze Mihemed, Memê Alan û Zîna Zeydan, Siyabendê Silivî û Xecê û wekî din mezin bûbûn, gihiyabûn, îcar li dibistanê çîrokên Dede Korkut, dîroka tirkî û osmaniyan û "qehremantiyên wan" derdiketin pêşîya me.

Li derveyî dibistanê jî, xêzeromanên mîna Tarkan, Kara Murat û hwd. li ber destên me bûn. Jixwe di sînemayê de serdestiya filmên tirk ên nijadperest hebû. Tarkan, Kara Murat, Malkoçoğlu û...

Ev tev wisa kişînok bûn ji me re, mirov nîzane bi çî awayî vê rewşê tarif bike. Leheng û xebereşkên me têk diçûn. Ev "çanda nû" êdî xweştir bû. Bi tirkî bûn, me jî wan fêhm dikir û tam li gorî dê û bavên me bûn ku di gotin "Bixwînin, ji xwe re bibin mirov".

Her çiqas li devera me "telebe" rabûbûn; doza kurdîtiyê dikirin û di dilanan de stran û klamên kurdî yê şoreşgerî dihatin strandin jî, ev rewş berde-wam bû.

Ji aliyê din ve, serpêhatiyên li ser "Terqa Şêx Seîd", Serhildana Sason, Geliyê Zilan ji me re dihatin gotin û tu kesî jî Atatürk bi xweşî xeber nedida; ji dîndaran heta bi çepgirî.

Tiştên ku li ser kurdan dihatin gotin, me jî devan dibihîst. Berhemên nivîskî kêm bûn û em jî, jê bêpar diman. Eşkere ye ku, gava berhemên nivîskî nebin û neyêne xwendin, hiş zû hişyar nabe û serî ranake. Dema agahî bi devkî be, zêde tesîra wê nîn e û ne mayînde ye.

Di pey derbeya leşkerî ya 12'ê rezberê ya 1980'yî de, me dest bi dibistana navîn kir. Li gorî dibistana seretayî em gihîştîr bûbûn. Mufredata dibistanê jî firehtir bûbûn. "Telebe" jî li rastê nemabûn. Hêvotîna nijadperest li qadê hesp direwiqandin. Digel pir-

Ev wekî rêxistina siyasî ya kurdan a pêşîn tê qebûlkirin. Di nav rêxistinê de xanedanên Kurdistanê yê girîng wekî Bedirxanî, Babanzadeyî û Şemzînanî cih standine. Hemen hemen ji her deverê Kurdistanê mirovên xuyanî beşdarî wê bûne.

tûkên dersê, pirtûkxaneya dibistanê û pirtûkfiros bi berhemên nijadperest tîjî dibûn.

Nemaze, pirtûkên Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü (Enstituya Lêgerînê ya li Ser Çanda Tirkî) li çok û qirikên bûn. Ew tev, kurd wekî tirk nîşan didan. Li gorî wan kurd tirk bûn, beriya Zayîna İsa ji Asyaya Navîn hatibûn Anadolê û ziman, çand û dîroka xwe wînda kiribûn. Zîmanekî col (tevlîhev) di axivîn ku ji tirkî, erebî, farişî, ermenî, rûsî û hwd. pêk hatibû.

Çîroka li ser peydabûna navê kurdan jî wiha vedî-



Seyid Abdulqadir Efendi

gotin: Kurd çiyayî ne, dema ku zivistanê li ser berfa qerisî meşiyane, ji bin piyên wan dengê "kart-kurt" derketiye û lewma ev nav li wan hatiye danîn.

Serkêşên van "zanyar"an jî Prof. Fahrettin Kırzoğlu, Mahmud Rişvan, A. Haluk Çay û hwd. bûn. Di nav wan kesan de kesên ku kurd bû jî hebûn, bi taybetî wan li xwendevan zêdetir tesîr dikir.

Van kesan dîroka "kurdên çiyayî" an jî "kurdên tirkî" hetanî gutiyan dibirin ku di bermahiyên sumeran ên nivîskî de ji gutiyan tê behskirin. Dîroka gutiyan, bi hejmareke gilover, heta 2500 sal beriya zayînê dibirin.

Jixwe li gorî wan kesan, çanda kurd û tirkî, baweriyên wan, tîpolojîya wan, yanê ji her aliyê ve wekhevîbûneke etnografîk, sosyolojîk, antropolojîk di nav kurd û tirkî de hebû.

Heta kurd li Balkanan jî bi cih bûbûn û navê 12 deverên li Macaristanê li gorî wan bi kurdî ne. Di dawiyê de kurd, tirk bûn û koma pêşîn a tirkî Asyaya Navîn bûne ku jê bar kirine û berê xwe dane Rojava û heta Balkanan çûne...

Mîna bi xwe, serê pêşîn bi wan pirtûkan xwe nas kir, li ser kurdan ez bûm xwedî agahî. Çendî ku wan nijadperestan dixwestin tirkbûnê, bi kurdan bidana pejirandin jî.

Di dema dibistana amadeyî de ji rewş her wisa bû. Çaxa ji serhildanên kurdan, wekî Şêx Seîd dihat behskirin, dilê min hildavêt, canê min disincirî. Gava ku navê Kürdistan Tealî Cemiyeti dihat bilêvkirin, di darsa İnkılap Tarihi (Dîroka Şoreşê) de, ev roman "Wa, pêşiyên me ji bo me xebat kirine. Du kevir ji me re dane ser hev", ji min re çêdibû. Jixwe peyva Kurdistanê têra xwe hebû.

Lê me nedizanî ku ew kî bûn, çawa têkoşibûn, çima ew tîk çûbûn? Serencama wan ji me re ne eşkere bûn...

Bi xurtbûna tevgera azadiyê re, dîroka me jî ronî didît. Em bi hev dihesiyan. Unîversîteyê asoya me firehtir û ronîtir kir.

Vêca em li ser Komeleya Bilindkirina Kurdistanê vebûn, ku li Stenbolê ji aliyê xanedan, burokrat, rewşenbîr û pêşawayên kurdan ve hatibû avakirin. Li gorî İsmail Gölbaş (pirtûka wî ya bi navê "Kürdistan Tealî Cemiyeti) di 17. 11. 1918'an de hatibû damezirandin. Lê hinek teqwmên rojnemeyên kurdan ev dîrok wekî gulana 1919'an nîşan didin...

Armanca wê yanê Komeleya Bilindkirina Kurdistanê jî ev bûye: Di nav sinorên osmanî de Kurdistanê otonom.


Ev komele, wekî rêxistina siyasî ya kurdan a pêşîn tê qebûlkirin. Di nav rêxistinê de xanedanên Kurdistanê yê girîng wekî Bedirxanî, Babanzadeyî û Şemzînanî cih standine. Hemen hemen ji her deverê Kurdistanê, mirovên xuyanî beşdarî wê bûne.

Serokê wê Seyid Abdulqadir Efendiye Şemzînanî û katibê Giştî jî Huseyn Şukriyê Baban bûye. Di nav endamên wê de jî Dr. M. Şukrî Sekban, Muhiştî Namî, Babanzade Hikmet Beg, Ezîz Beg, xwediyê rojnemeya Serbestî Mewlanazade Rifat, Memdûh Selîm Beg, İhsan Nûrî Paşa, Leyla Xanim û (şûyê wê) Şerîf Paşa, Hacî Ahdî (Bavê Tûjo), Xalit Begê Cibrî, Celadet Bedirxan, Kamuran Bedirxan û hwd. hebûne.

Serokê Şûraya Dewletê û Endamê Meclîsa Ayanan ên osmanî Seyid Abdulqadir, tevî Şêx Seîd û hevalên wî li Amedê tîne daleqandin.

Ku Seyid Abdulqadir gotibû "Di vê dema ku birayên me yê tirkî di tengasiyê de ne, ne serm e ku em kurd alî wan nekin." Belê, ev gotin di dema Şerê Cihanê yê pêşîn de hatibûn gotin. Û ew serokê "komeleyeke ziyandar" bû.

M. RONAK



Evdîrehman axa

● 26 Gulan / 25 Gelawêj 1927

Serhildana Mutkî dest pê kir. Dewleta tirk ji bo ku careke din serhildanên kurdan çênebin dest datanî ser çekên wan û ew ji herêmê dur dixistin. Li hemberî van kirinên dewletê, 8 eşîrên 35 gundan li hemberî artêşa tirk dest bi şer kirin. Artêşa tirk di demeke kurt de bi hezaran leşker li herêmê bi cih kir û dest bi operasyonên berfireh kirin. Di şer de serokê eşîran Şêx Evdîrehman, Mehmet Elî Yûnis, Zekî Selîm birîndar bûn, serhildan cih bi cih li çiyayan, heta 25'ê gelawêjê dom kir.

● Gulan 1913

Damezirandina Komeleya Hêvî li Stenbolê. Komeleya Hêvî ji aliyê

rewşenbîr û ronakbîrên kurd ve bi mebesta pêkanîna eniyeye siyasî û çandî, hunerî ji bo xwendekarên universîteyan û kurdên ku li Stenbolê dijîn, hate avakirin.

● Gulan 1969

DDKO, ango Kanên Çandî yê Şoreşger ên Rojhilat hate damezirandin. 1'ê pûşperê ji aliyê UNICEF'ê wekî 'Roja Zarokên Cîhanê' hatiye pejirandin.

● 1 Pûşper 1960

485 giregirên kurd ji aliyê dewleta tirk ve hatine girtin û li Sêwazê xistine kampeke leşkerî.

AWIR

Stran dengê şoreşê bilind dikin



Çemenek ji Koma Amed

Geleên bindest, li ser xwe stran afirandine û hin ji wan bûne sembola têkoşîna wan. Wekî ku di şoreşa Nîkaragûayê de keçikeye gerîla bi navê Carla stranek gotiye û ew bûye strana şoreşa wan. Dîsa di dema şerê dinyayê yê yekemîn de cûhiyên ku ji aliyê almanan ve dihatine qetilkirin ji stranek ji bo azadiya xwe gotine. Ev stran hêza berxwedanê, hêza şoreşê bi wan re çêkiriye û yekîtiyek, bihevrebûnek di nav wan de pêk aniye.

Di vî warî de derd û kulên civaka kurd ji bi salan di stranan de mane, li cem dengbêjan mane. Mirovên hin herêman ew stran bihîstine û hinan ji ew nebîhîstine. Berê, dema ku Radyoya Êrîvanê dest bi stranên kurdî dikir, pir kes digiriyan û digotin "Aha ev strana jiyana min e." Van stranan gel hişyar kir û stranan dengê şoreşa kurdan bilind kirin. Em roja îro ne di nav wan mercên giran de ne ku bi saetan li benda Radyoya Êrîvanê bimînin, em dikarin li NÇM'ê ji komên muzîkê yê kurd stranên xwe yê gelêrî, yê şoreşgerî, yê nûjen ku jiyana me tînin ber çavan em guhdarî bikin, wan hunermendên ku me dengên wan dibihîst, lê me ew nas nedikirin jî, bi çavên xwe bibînin.

Heftiya çûyî Koma Amed li NÇM'ê konserê da; 200 kes ji bo temaşekirinê hatibûn, lê ez bawer im ku heke li salona NÇM'ê cihê hezaran kesî bûya jî, wê tiye bibûya. Gel êdî têgihîşt ku çalakiyên çand û hunerî bêhtir mirovan hişyar dikin. Dema ku stranên şoreşê dihatin strandin, xemgîni ji rûyên wan kifş dibû. Lê dema ku stranên gelêrî digotin, ji kêf û coşa wan re ji mirov nikaribû tişteki bi-

got. Koma Amed, ji pêşkêşkirina stranan bigire, heta bi ahenga di navbera deng, muzîk û hereketan de, bi her awayî ji bo coşandina temaşevanan motîvasiyonek çêdikir.


Dîroka Koma Amed ji wiha ye; di sala 1988'an de li Enqereyê ji aliyê Fikrî K. Dr. Ahmet û hin hunermendên ku vêga li derveyî welêt in hatiye avakirin. Di salên 1990'î de kasetek bi navê "Kulîlka Azadiyê" çêkirine. Ji ber ku wê demê zimanê kurdî qedexe bû, ew kaset hate berhevkerin. Piştî re di sala 1992'an de qedexe ji ser axaftina zimanê kurdî ku rabû, kaset jî serbest bû. Piştî ku NÇM'ê ava bû, Koma Amed xebatên xwe li navenda NÇM'ê berdewam kirin. Di vê navê de du hunermendên din beşdarî komê bûn, wekî Silêman û Serhad. Piştî re di sala 1995'an de kaseteke din bi navê "Agir û Mirov" çêkirin; piştî vê kasetê hunermendêke din, Serap tevî komê bû.

Xebata ku Koma Amed dike ji bo pêkanîna muzîkeke neteweyî, dibe sedema avêtina gavên girîng. Her wiha endamên komê besteyan, muzîk û rastkirina stranan jî bi xwe çêdikin. Ev jî nîşan dide ku, di warê muzîkê de bûne pispor, lê tişteki din jî hin heye; hunermend bi zimanê kurdî nizanin, tevî ku bi kurdî stranan dibêjin. Koma Amed, di konserê de hin stranên gelêrî û yê nûjen pêşkêş kirin: "Xoymamo, Êvar e, Tu kulîlka azadiyê yî, Were rindê rindê, Berî her tiştî ez kurd im, Tu ku da diçî ax kesera dilê min", yê nûjen jî ku peyvên wan li navendê hatine nivîsandin "Kurê min, Şivano" yê bi zazakî, bi muzîkeke pir dengî ve pêşkêş kirin.

METİN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YIĞÎT



Pirsa yekîtiyê, muhafizekartî û Yekîtiya Hiqûqnasan

Her çendî ji kevin de ji rewş û demên derbasbûyî mabe û ew çendî bi roja îroyîn re ne gunce jî, em hin bûne, em bibêjin: "Kurd nabin yek. Yekîtiya kurdan tune ye. Kurd mîna nanê garî in hev û du nagirin".

Ev çendî wiha ye, ev tesbît çendî di cihê xwe de ye? Em bi hev re lê bikolin ka çendî rast e û çendî na. Ev tesbît û ev îdia do rast bû. Lê îro ne wiha ye. Ji rastiya xwe pir tişt wînda kirine û têrî berlepkirin û zeftkirina rastiye nake. Rastî êdî di vê hem-bêzê de hîlnaye. Tesbît bersiva îro nade. Ne bi qonax û serdema me re ye. Kurt û bi kurdî: Dikule, bitelekî diçe, maye bi lingekî û netemam e.

Çima wiha ye?

Bi giştî û bi gelemperî ne bi tenê li welatê me, belê li her aliyê cîhanê piraniya xelkê; rej û baskên civakî, rewşenbîrî, dadmendî û îdarî tim çend gavan bi dû zemên de tên. Hejmara law û keçên ku bi fikarên xwe yê zemên in seraqet kêm e. Ferq ev e: Heger li welatên xelkê ev carekê wiha be, li welatê me çend caran wiha ye. Heger li welatên xelkê carekê muhafizekartî hebe, li welatê me sed carî heye. Sedem jî ev e ku însan ji do û berê, pêr, betirpêr, pêrar, betirpêrar bar kirine, bi zirxê sal û sedsalên bihurî rapêçayî ne û ev jî mirovahiyê dixwe asêgehê. Mirov ji vê asêgeha nexuya li meseleyan dinêre, hedîsengine, dinîrxîne, dipîve û diwezînine, tesbîtan dike, diyarde û bûyeran munaqеше dike, ditin û ramanên xwe ava dike, dibêje û dibilîne.

Belê ji bîra dibe ku piraniya caran ne însanê roja hazir û aktûel bi xwe, lê rojên kevnar û emirmende, meh û salên ku bûne malê kitêb û kitêbxaneyan, muzexane û cihên entîke qise dikin. Sebeb çî ye niha ji bo me ne pîrsa serekî ye. Em bi tenê dikarin bibêjin ku ev jî cihêtiya nav pêşketinê, guhertin û herka civakî li aliyekî û kapasîteya taqîbkirina herka giştî û nisbeta beşdariya mirov di nav de li aliyê din tî pê. Mirov çendî di nav guhertinan de be, çendî bi xwe bûbe pişikdar û handarê guhertin û pêşketinan, ew çendî jî ji bin bandêra fikirin û muhakemekirina kevin derdikeve û li serdema xwe nêzik dibe. Bervajî, mirov çendî li tenîşt û qiraxan bişî, di nav toz û tirabêlka jiyana hûr û malbatî de, di nav diriyayeke ji xwe re, bêmefer û guvaştî de rabe û rûne, ew çendî mêjiyê mirov giran kar dike, sererû, hawîrdornebîn, hiskor û hestbetilî, ker û guhgiran, çavqels û çevşelbîtî dibe. Piraniya me jî em hê ji nav vî kategoriya duyemîn derneketine û tam zeft nakin, tam û baş û nagihîn li welatê me çî dibe û çî diqewime, guhertin çendî kûr in, çendî dirokî û welatgir in.

Piraniya me kur û keçên doh in, muhafizekar in; kevnemêji û kevnepiraniya in. Dûrîllim û ne hemdem in. Lê ev giş rastiya me ye. Di nav me de kategori û beşeke nû çêdibe. Ev kategori bi zemanê xwe re ye, bişî û e, agahdarê meyl û şîpa serekî ye. Mêjîmezî û dilxurt e, guhertinbîn û statûşkên e. Ne bi tenê mil bi mil bi zemên re ye, belê her wiha li zemên siwar e. Xweyî însiyatîf e û bi rêberiya vî beşê civatê mêjiyê giştî, mêjiyê neteweyî û giş sehkarên me xwe jî nû ve vedikin, kat didin û hiş û bireke nû dikeve rê. Hestwestiyayî, dewixyên doh, guhgiran û çavşikestî li her welatî hene li welatê me jî dê hebin ev jî ne hêjayî paxavan in.

Em bi dilxweşî û dilniyayîyeke temam dikarin bibêjin ku li ser rîya yekîtiyê û hev-dugirtinê, bihevrebûyîn û lihevbanîne em teqneki meşîyan e û rewşa me qet bi ya do re nayê muqayesekirin. Sala ku yekîtiyek û çend yekîtiyên me ava nabin, sazî û dezgeheke me vî neteweyî neyê pê tune. Xwendevanên Azadiya Welat agahdar in di nav dudo û sîsiyê meha adarê de li Almanya li bajarê Osnabrûkê hiqûqnasên kurd û Kurdistanî konferansê li dar xistin û bi beşdariyek li dora 50 kesî û bi yekdengîyeke temam Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê ava kirin. Bêje hema îro giş alî û teyarên neteweya me yekîtiyên xwe yê siyasî, eskerî, civakî, kulturî, pişeyî, xwendevanî, rewşenbîrî, akademîk û diplomatîk dadimezirînin. Dibe ku mîna dil dixwaze ne xurt bin, kar û xebatên wan bi yê neteweyên hemdem re mirov nikaribe muqayese bike. Belê ev jî ne dîr e. Hedef yekîtiyên temam, kamil, xurt û layiqî navê xwe ne.

Wek encam: Êdî wext e em gotinên xwe baştir bifikirin û nîrxandin û tesbîten xwe bişîurtir bikin.

Em bi gazinc in ku çima li ser gerîla roman, çîrok, helbest, muzîk û hwd. ên hêja nayên nivîsîn û çêkirin. Ev gazinc di nameya şervanekî şehîd de jî heye ku ji DILBIXWÎN DARÀ re şandiye. Birêz Dara di 14. 03. 1996'an de bi nivîseke bîrewerî hem bersiva wê dide û hem jî nameyê pêşkêşî xwendevanan dike.

Berî vê bi çend rojan, piştî çend salan, min hevalekî birîndar dît. Ez jî nizamim çima, xwîna birîndarên şer bi mirov, gelekî şîrîn e. Hevalê birîndar di şer de çavekî xwe winda kiribû. Berî ku derbasî welat bibe, me hev baş nas dikir. Mala me li kêleka hev bû. Em bi hev re mezin bûn. Xweşî û reşîya rojên zaroktiyê, me bi hev re derbas kirin. Wê demê, çavên wî sax bûn, wekî niha ne bi çavekî bû, lê belê ew li pêşîya çavên min jî berê şîrîntir e. Xwîna min gelekî bi ser wî de dikele. Dilê min dixwaze ez wî di nava ruhê xwe de veşêrim, ew qasî bi min şîrîn bûye!

Em li maleke welatparêz bûn. Malên welatparêzan wekî malên me ne. Heya serê beyanê em li ser bûyer, bîranîn û serpêhatîyan mijûl bûn. Şevên zivistanê dirêj in, bi zor me xwe gihande berbangê. Birîna di çavên hevalê min de jan dida, lê belê êşkere nedikiri ez pê dihesiyam, lê hema destê min ji wî nedibûn.

Hêdî hêdî rojê xwe ji nava nivînan derxist, berê xwe da me, kenîya û bi dengêkî sivik got: Rojbaş hevalino.. Hevalê min destê xwe dirêjî berîka xwe kir û nameyek derxist:

– Ev nameya hevalekî ye. Ji nava şer min ji te re aniye. Hevalekî gerîla şand. Min soz da wî ku, ezê nameyê bigihînim te... Çend sal derbas bûne, belkî te ew jî bîr kiribe jî, kî dizane...?

– Na, tu caran bîranînen hevalan ji bîra min naçin....

Û min bi heyecanekê, name ji destê hevalê xwe girt.

– Hêdî bixwîne heval, heya ku gihîştê destê min, di bin destê du hevalên şehîd re derbas bû. Min jî berîka hevalekî şehîd derxist, berî ku şehîd bikeve, hevalan biryar standibûn ku ew jî were vê saheyê; bi re ve, di kemîneke neyaran de şehîd ket. Dema ku min çeka wî rakir, çavên min li nameyê ket û min dît ku ji te rê hatiye nivîsandin, bila xwendina wê ji bo wan hevalan jî bibe bîranînek.

Bêhna xwîne ji nameyê dihat, lekeye xwîne jî, li koşeyê wê. Min nexwest ez nameyê biêşnim. Di nava destên min de wekî gulekê diyar dibû, wekî guleke wisa ku nû bişkivî be. Li pêşîya çavên min her tîpek di nameyê de bû dilopeke xûnavê, ku di şefaqê de wekî stêrkan li ser rûyê pelên kulîlkan bi mirovan re dikenin. Dilê min germ lê da û çavên min bêhemd tijî hêstir bûn. Min bi nermî li kêleka xwe meyzand, hevalê min kesereke kûr dikişand, ew jî heya qirikê ketibû nava bîranînan, tu nemabû ku bifetise. Ez sivik kenîyam û min got:

– Emê kengê van bîranînan, van serpehatî û jana di devê birînan de bikin

roman? Emê kengê careke din hev bînin, êdî piştî me li ber dîwarên biyanîyê kurmî bûne, emê çawa wan hevalan razî bikin, em dikarin çi bikin..? Canê min dişewite, ew salên ku derbas bûne, min di nava xwe de dikelînin. Wekî aşekî min di nava diranên xwe de dihêrin, ez li xwe heyirîme, nizamim çi bikim...

Hevalê min hêdî hêdî serê xwe hejand, destê xwe avête ser milê min û got:

– Hinek ji hevalên me şehîd ketin. Hinek birîndar bûn û wekî min çavên xwe ji Kurdistanê re kirine xelat û diyarî, hinekan jî fişkek ji xwe re hiştin û canê xwe dane ber devê tivingê, kesekî gava xwe bi paş ve neavêt. Hevalên me xwe di pişt kevîran de veneşartin, te şûna birîne di piştî wan de nedidît. Mixabin. di dilê min de bûye hesret ku ez romanekê li ser lehengiya wan qehremanan bibînim.

Belê, tu caran ew roj ji bîra min neçûn, dema ku hevala belavok ji me re dixwendin û rojnameya Berxwedanê ji me re dianîn. Bi Berxwedanê em hîni xwendin û nivîsandina kurdî bûn. Wê demê em xwendevan bûn. Kom bi kom me ew belavok û rojname dixwendin. Di serê her hevalekî de ji me, plan û tevdierek hebû, her yek ji me jî xwe re li ser tiştêkî difikirî. Lê belê, xeleka ku em digihandine hev, dîsa wekî her carê şoreş bû. Kî dikare ji şoreşê re çi pêşkêş bike? Ji xwe re em bi hev re li bersiva vê pirsê digerîyan.

Di nava me de hevalekî hunermend hebû, di her tiliyekî wî de hunerek dihatê dîtî. Tembûr, ûd û piyano di destên wî de perîşan dibûn. Dengêkî xweş li ser wî bû, dema ku helbest dinivîsandin, Pablo Neruda dihatê bîra te. Aştiqekî welat bû. Car caran li tembûrê dida û digirîya, em jî li ber dengê tembûra wî rûdiniştin û digerîyan. Cîranan jî deriyên malên xwe digirtin û dihatin bi me re tevî wê damayê dibûn. Hinek caran stranên li ser şehîd û hevalan mirov digirînin, ev jî ne di destê me de bû.


Em ji hev qut bûn, her yekî ji me berê xwe da aliyekî. Ev çend sal in ku, em dengê hev nabihîzin. Wî hevalî xwe gihande nava refên gerîla. Me hev jî bîr nekir, piştî çend salan be jî niha nameya wî di nava destê min de ye û ezê piştî çend gotinan ji we re bixwînim.

Bi rastî ew rojên derbasbûyî, her sibeh wekî gulên di dilê min de vedibin. Ev hêstirên ku hîna jî çavên min têne xwarê – bila xwendevan biborin – li ser dêmên wan guhan, dibin wekî xûnavên di rojên Newrozê de.

Hevalê min ji nişka ve min hişyar dike:

– Heval, di nava destên te de nameyek heye. Bixwîne û bila em bibihîzin...


Rojbaş



”Baş tê bîra min, wê demê min wiha gotibû: ‘Eger ku tiştêk neyê serê min û şehîd nekevim, ezê romana gerîla, strana gerîla û şerê gerîla ji we re pêşkêş bikim. Lê belê di nava şer de her tişt mimkun e, dibe ku ez li ser sînor jî şehîd bikevim, wê demê barê min dibe barê we. Ez pênuş û tembûra xwe ya ku her demî di şîn û şahîyan de bi min re hevaltî dikir, ez bi dilsozî ji we re dikim xelat.’”



heval!



“Di nava me de hevalekî hunermend hebû, di her tiliyekî wî de hunerek dihate dîtin. Tembûr, ûd û piyano di destên wî de perîşan dibûn. Dengekî xweş li ser wî bû, dema ku helbest dinivîsandin, Pablo Neruda dihate bîra te. Aşiqekî welat bû. Car caran li tembûrê dida û digiriya, em jî li ber dengê tembûra wî rûdiniştin û digeriyan. Cîranan jî deriyên malên xwe digirtin û dihatin bi me re tevî wê dramayê dibûn.”

Ez nameyê li ser piştê vedikim. Têde hevalên xwe dibînim ku, xwe bi rexte û şûtikê şidandiye û tivingek avêtiye ser milê xwe. Bêhna min teng dibe, lê belê ezê ji we re wê nameyê bixwînim: “Rojbaş hevalê min!

Biborin, wekî kesên din ez nikarin nameyan dirêj binivîsînim, tu dizanî ez gelekî ji nivîsên dirêj hez nakim. Belkî tê bîra te, helbestên min jî kurt bûn, stranên ku min digotin jî wekî yên Kawûs Axa, Cemîl Horo, Meryem Xan û Gerabête Xaço ne dirêj bûn. Ezê vê nameyê kin binivîsînim, ne serê te biêşînim, ne jî zemanê te bi xwendina wê re bikujim.

Ez hinek caran serpehatî û biranînên berî çend salan tînim bîra xwe, biborin, li vir zeman wekî şûr e, eger tu qut nekî wê te qut bike. Ez mecalê nabînim ku her demê li ser wan rojan bifikirim. Lê belê ez tu caran ji bîr nakim jî, hevaltiyeke durist di navbera me de hebû.

Em bi hezaran kîlometran ji hev dûr in. Tu li aliyekî dinyayê yî, ez li aliyê dinyayê yê din im. Disa jî, em bi yek dilî dijîn.

Em pê nahesin û sal derbas dibin. Wekî dizên şevên zivistanê diçin û tî, ji xwe re hêdî hêdî bêyî ku me biêşînin, wekî ku di payîzê de pel ji daran diweşin, salan ji umrê me qut dikin û didizî.

Ez bawer dikim wê te ji bîr nekiribe, dema ku me xatirê dawiyê ji hev xwest û ez derbasî welat bûm, wekî ku niha min gotibe, baş tê bîra min, wê demê min wiha got: “Eger ku tiştê neyê serê min û şehîd nekevim, ezê romana gerîla, strana gerîla û şerê gerîla ji we re pêşkêş bikim. Lê belê di nava şer de her tişt mimkun e, dibe ku ez li ser sînorê jî şehîd bikevim, wê demê barê min dibe barê we. Ez pênuş û tembûra xwe ya ku her demî di şîn û şahiyên de bi min re hevaltî dikir, ez bi dilsozî ji we re dikim xelat.”

Ev çend sal in ez li vê derê me. Di destekî min de tiving, di destê din de jî, tembûra min heye. Bi vê tembûra ku min ji hevlekî şehîd standiye, ez şevên moralê geş dikim. Li vir dengê min jî, ji berê xurtir bûye. Ne tenê li ser tembûrê, li ser tivingê jî ez hunermendekî baş im. Eger ku tu ne hunermendekî baş bî, tu nikarî şer bikî. Şer, hunereke bilind dixwaze.

Ez şehîd neketim. Lê belê, li Zagrosê ez bi rojan di bin berfê de mam. Hinek hevalên me şehîd ketin, li pêşiya çavên min can dan, were ji min bipirse. Eger ku namûs bi me re hebe, emê tu caran wan hevalên ku di bin berfê de can dan û tevî karwanê pakrewanan bûn, ji bîr nekin (...) Ezê rojekî li ser wan çend tiştan binivîsim. Nalenala wan hevalan hîna ji guhê min derneketiye.

Helbest û stranên min ên nû gelek in. Piraniya gotinên wan stranên hevalên şehîd nivîsandin. Belkî tu meraq dikî, gelo ez kengê ji hevalan re stranên dibêjim? Li vir şevên moralê hene. Her wiha tevlîbûna her şerekî bi serê xwe moraleke mezin e. Dema ku em bi rê dîkevin û dema ku em ji şer vedigerin, tu dikarî dengê min bilind bibihîzî. Hi-

nek caran ez, hinek caran jî hevalên min, ezman li ber dengê me diricife. Hevalên ku em bi hev re ne, piranî ji herêma Botan in, dema ku tu dibêjî dîlan ruhê wan diçe; hema bi destê hev digirin û dest bi “Ez Xelef im” dikin.

Ev çend sal in, tevî hemû derfet û îmkanan jî, hûn nikarin koro û orkestrayekê ava bikin. Were binêre, me Mozart û Beethoven jî derbas kiriye. Eger tu dixwazî li dengê harmonîkî, operatî û li senfoniyan şoreşê guhdarî bikî, were her tişt li vê derê heye.

Zimanê min nagere ez her tiştî bibêjim, ji ber ku ezê nikaribim bînim ziman. Wê name dirêj bibe, ez naxwazim gotineke ku ne di cihê xwe de be, bibêjim.

“Hey av û av....”

Tu jî, bi eşq û meşûqî...” ya Feqiyê Teyran, dengê bilbil û çivîkên li ser şaxên daran, mêşên hungiv û bayê ku di ser berfê re dixuşe, bi dengê tiving, top û bombeyan re, bi stranên hevalan re... senfoniya şoreşa Kurdistanê pêşkêş dikin. Ez wan stranên ku hunermendên wê derê ji me re dişînin, biçûk nabînim, ew jî xebateke mezin pêşkêş dikin. Lê belê ev der dinyayeke din e.

Ji xwe re bifikire. Hevalek li kêleka te birîndar dikeve, nêzikî şehîdbûnê dibê, kûr dinala, tembûra te ji di destê te de ye, wê demê tu dikarî straneke çawa bibêjî, wê dengekî çawa ji nava hinavên te derkeve, were û cigera xwe bi tîlên wê tembûrê parçe neke (...)

Min tiştêkî din jî bihîst; dibêjin li wê derê dîtina rojê di dilê we de bûye hesret, van rojan hevaleyê ji wan deran tevî me bû û wiha got: “Ez naxwazim dilê ewrûpiyan biêşînim, lê belê dema ku Ewrûpa tê bîra min, ez di ezmanê wê de, rojê wekî zembîlekê dibînim.” Wekî wê zembîla ku bapîrê min pê kevir dikişandin.

Bila li dilê kesekî nemîne, roj wekî bûkekê, li ser sînga ezmanê welatê min xwe dixemilîne. Dema ku dibe şefeq, ev çiya wekî gulên ku li ser gora şehîdan sor dibin, sor dike. Picasso jî nikare tabloyeke wiha ciwan û bedew çêbike.

Dema ku roj hêdî hêdî çavên xwe digire û diçe razanê, stêrk kincên xwe li xwe dikin, çavên xwe dişon û bi rûyekî bi ken şûna rojê digirin. Fantom û Kobrayên artêşa tirk jî, ku her şev derdikevin operasyonan, nikarin wan stêrkan bitirsînin.

Bêguman li wê derê rewş bi awayekî din e. Însan bi tank û topan nayên kuştin, gund û çiya naşewitin, teqîna bombeyan serê mirovan nateqînin... Lê hema jiyana tê firotin û jin dibin reklam û dadikevin bazarê. Li vê derê keçên kurd wekî egîdan sînga xwe didine ber devê topan û namûsa welat diparêzin.

Her tişt, tiştêkî din bi xwe re tîne. Her mirinek jiyanekê diafirîne. Her şehîdek rûpeleke nû ye, di dirûka nû de. Em li aliyekî tîne kuştin, li aliyê din jî gulên rengîn bi xwîna xwe av didin, bila tî nemînin û neçilmisin.

Li dawiyê, destên we yeko yeko diguşişim û silav û hurmetên xwe yên şoreşgerî ji we hemû hevalan re pêşkêş dikim...”

'Ez tim bi doza neteweyî re bûm'



Sıraç Bilgin.

Di destpêka 1960'î de, jiya-
na we bi têkoşinê tijî ye.
Her wisa navê we, ji bûye-
ra 49'an û vir de, ji aliyê
raya giştî ve tete zanin. Digel vê yekê
jî, ez dixwazim bi pirsê "Dr. Siraç Bil-
gin kî ye û kengê dest bi siyaseta kirî-
ve?" dest pê bikim.

- Ez bi xwe li sirgûnê jî dayika xwe
bûme. Di sala 1944'an de li Kurdistana
Sûriyê hatime dinyayê. Mirovên me
tevî tevgera Şêx Seîd bûn, piştî têkçû-
na tevgerê, dê û bavê min reviyên, be-
rê xwe dan Kurdistana Sûriyê û li wir
bi cih bûn.

Kolonyalizma ereban jî, kurd jî hev

xistibûn. Di wê demê de ez û çend kur-
dên şîrhelal li dijî nijadperestên ereban
derketin û me dest bi xwepêşandan û
protestoyan kir. Di nava vê jiyan û
berxwedana neteweyî de, ez pir êş-
yam. Di dawiya sala 1950'yî de em ve-
geriyên warê bav û kalan. Lê dewleta
tirk her tim li pey me bû; gav bi gav...

*Tiştên herî girîng ên ku tîn bîra we
çî ne?*

- Xwepêşandanên kurdan ên ku li
dijî dewletên ereban, xwendina helbes-
tên Cegerxwîn, pîrozkirina Komara
Mehabadê; wek xewnekê tîn bîra min.
Di avakirina kesitiya min de, hawirdo-

**Di sala 1964-67'an de, li Kurdistanê bi navê "Mîtingên
Rojhilat" xwepêşandan pêk hatin. Di xwepêşandana
Batmanê de min axaftinek kir, axaftineke tûj û bi kurdi
bû. Ez hatim girtin. Wê şevê ta serê sibê 200 heb
Batmanî dora qereqolê girtibûn, diçûn û dihatin.
Paşê wan ez berdîm, ez çûm Dêrsimê, lê TIP'ê
nehişt ku ez biaxivim, ez vegeryam Enqereyê.**

ra min roleke mezin lîstiyê. Min di
pênc saliya xwe de helbestên Cegerx-
wîn jî ber kiribûn û dizanibû ku hel-
bestên wî neşterê li birînan, kûr dixin û
birînê jî nû ve vedikin.

Hêla ku ez lê bûm pir bi herket bû;
kurdperestî, kurdistanxwazî, berxwe-
dan û bîranînen neteweyî hebûn. Ew
ketin nava xwîn û hestiyên min û tê de
bi cih bûn.

*Zaroktiya we li Başûrê Biçûk der-
bas bû û we jî xwe re heval çêkiribûn.
Lê mirovên we li bakurê Kurdistanê di-
jiyan. Gelo hûn dikarin hinek li ser ve-
gera malbata xwe rawestin?*

- Di dawiya sala 1950'yî de efûya
giştî derket, em vegeryan warê xwe yê
berê; gundekî Çermûgê. Ji aliyê din ve
jî, dê û bavê min pir bêriya mirovên
xwe kiribûn. Di hêla me de, tenê bavê
min bi navê kurdperest dihat navandin.
Ji lew re jî sîxûr û xwefiroşên kurd li
pey bavê min bûn; gav bi gav. Bavê
min bi eslê xwe şêx bû. Hikûmeta tirk
a har û hov, êrîşî ser malbata me dikir;
dixwestin dengê bavê min bidin birîn.
Malbata me belawela kirin û ta ku yar
jî yarî dûr ma.

Tiştê ku ez dixistim nava xebata si-
yasî, kurdperestiya bavê min bû. Di sa-
la 1962'an de min xwendegeha bilind
beşa doktoriyê qezenc kir û min dest bi
xwendegehê kir. Di xwendegehê de, ez
hatim êşandim. Di wê demê de rew-
şenbîrên kurd xwe tirk didîtin; malba-
ta me, xwe kurd didîtin...

Di bin zilma tirkan de, birîndarkiri-
na hisên kurdane û her wisa jî derew-
kirin, xwebiçûkdîtin û netewe-inkarî
anîbû holê. Li dijî vê yekê, bavê min
xebateke bêhempa dikir.

Dewleta tirk, welatparêzên kurd di-
êşandin. Carinan bi derê zorê, carinan
bi dek û propagandeyê, dixwestin ku
nav û zimane kurd bihînin jêrîkirin û
kurdan bikin tirk. Lê nika... bûn...

*Dema mirov li dirêkê dinîhên, bû-
yera 49'an 10 salan dom kir û b' dîv*

*re rewşenbîrên kurd bi fermana Serokê
Giştî yê Artêşa Tirkiyeyê Cevdet Sunay
hatin darizandin. Em bi kurtahî vege-
rin ser wê demê û bûyera 49'an...*

- Dîroka 1949'an, pir girîng e. Di
wê demê de bavê min û Şevket girani-
ya xwe hebûn. Ew dîrok pir girîng bû,
lê ne homojen bû. 50 kes hatin girtin;
yek mir û yê din man. Ew bi navê ko-
ma 49'an dihatin navandin. Gava ku jî
girtîgehê derketin, piraniya wan dev ji
karê siyasî berdîm. Yê min Naci
Kutlay, Musa Anter û Yaşar Kaya jî di
nava Partiya Karker a Tirkiyeyê (TIP)
de cihê xwe girtibûn, yanê bûbûn çepê
tirk û dixwestin ku em jî li ba TIP'ê cih
bigirin.

Di wê demê de TIP'ê tiştên nû digot-
tin û her wisa jî sloganên TIP'ê xwest
bûn, gotinên gilover digotin, lê ne jî bo
kurdan bûn. Pêşveçûna Kurdistanê bi
doza azadiya karkeran re girê didan û
kurd mîna neteweyêke biçûk didîtin.
Ez bi xwe li dijî vê dîtinê bûm. Ji lew
re, me dest bi xebatê kir, me xwest ku
em rêxistineke Kurdistanî çêkin, lê me
jî karê rêxistinî fêhm nedikir, serboriyên
me tune bûn. Heta sala 1965'an wisa
bû.

Me bihîst ku li Kurdistanê Partiya
Demokrat çêbûye; wê pir ronahî da
me, Seîd Elçî ava kiribû. Min bi xwe
xwest mîna Partiyêke Demokrat tiştêkî
hevçot (paralel) çêkim. Lê zanabûna
min tune bû, serboriyên me kesî tune
bûn. Digel vê yekê jî, me xwest ku em
rêxistineke Kurdistanî çêkin. Em şêş
heb dihatin ba hev û civîn pêk dianîn.

Gava ku yekî jî xwe re rojnameyekê
bixwenda, me digot ew ajan e û li pey
me ye. Me jî xwe re dinyayên fantazî
çêdikirin. Di sala 1966'an de du nivîs
hatin weşandin; tê de qala kurdan dihat
kirin, digotin:

"Kurdên Hekariyê qirêj û pis in, em
dê tirkên paqij binin li Hekariyê bi cih
bikin. Em dê kurd û tirkan bi hev re bi-
din zewicandin, bila tirkên paqij jî wan
çêbin."

Li dijî van her du nivîsan, me bela-



Münir Ceylan

- LI NÇM'ê vê heftiyê ev çalaki hene:
- 26.5.1996 Yekşem: Konsera Ahmet Koç û Koma Heft Qereñilan, saet: 14.00, Teatra Jiyana Nû, Lîstika Rojbaş, saet: 18.00
- 29.5.1996 Çarşem: Semînera Münir Ceylan, li ser têkoşîna çînavetiyê, saet: 18.00
- 31.5.1996 În: Sohbet Cezmî Ersöz, li ser surîştê, veqetîn û biyanbûnê, saet: 18.00
- LI NÇM'ya İzmirê vê heftiyê:
- 26.5.1996 Yekşem: Li ser fîlozofî, welatparêzî, wêjevanî, rewşenbîriya Ehmedê Xanî axaftin Dr. Ali Rîza, saet: 15.00, Şano "Hêviya me hûn in"

saet: 19.00

- LI BEKSAV'ê vê heftiyê:

- 26.5.1996 Yekşem: Şano ji BEKSAV'ê, saet: 18.00
- 31.5.1996 În: Konser ji komên BEKSAV'ê, gîtar, flut, koro, saet: 19.00
- LI Evrensel Kûltûr Merkezi vê heftiyê:
- 26.5.1996 Yekşem: Fîlmê belgeyî, "Şahiya Zarokan", saet: 12.00
- 27.5.1996 Duşem: Fîlm: Di tariyê de qîrînek, rejîsor Fred Schepsi, saet: 19.00
- 31.5.1996 În: Koma şanoyê Sahneya Teknikê ya ITÜ'yê, saet: 19.00

RÛDAN



Kesên ku bi navê 49'an derbasî dîroka kurd a nêzik bûn, li dadgehê di dema darizandinê de têne dîtin.

vok belav kirin, ên belavok nivîsandin li Swêdê dijîn, ji wan du kes jî li welêt dijîn. Gava mirov, li salên 1960'î dihizire, digel kurdên xwenda, dîtinên kurdîtiyê hêdî hêdî xwe nîşan didan û hîsên neteweyî ji mirinê sax dibûn û ji nû ve dizan.

Wekî tê zanîn, di wan salan de kurdên, sedema şermê û xwebiçûkdîtinê bû.

Di sala 1964-67'an de, li Kurdistanê bi navê "Mîtingên Rojhilat" xwepêşandan pêk hatin. Di xwepêşandana Batmanê de min axaftinek kir, axaftineke tûj û bi kurdî bû. Li gorî wê demê bûyereke pîr mezin bû, lê dibe ku niha piçûk were dîtin; ez hatim girtin. Wê şevê ta serê sibê 200 heb Batmanî dora qereqolê girtibûn, diçûn û dihatin. Paşê wan ez berdâm, ez çûm Dêrsimê, lê TÎP'ê nehişt ku ez biaxivim. Ez vegeyriyam hatim Enqereyê.

Li wê derê me civînek çêkir, komîteyek hat hilbijartin. Bi pêşniyaza hevalan ez bûm birêveberê wê.

Di sala 1967'an de me xwepêşandaneke mezin çêkir. Sê hezar polîsî dora xwepêşandane girtibûn û dixwestin provakasyonê çêkin.

Hêdî hêdî pîrsa neteweyî geş dibû û bi pêş ve diçû. DDKO çêbû. Di sala 1971'ê de 200 kurd hatin girtin, ez jî di nav wan de bûm. Di nav girtiyan de du kom hebûn; Kurdistanxwaz (kurdperwer) û alîgirên TÎP'ê.

Koma TÎP'ê: Naci Kutlay, Musa Anter, Tarık Ziya Ekinci...

Koma kurdistanxwazan: Ez, Orhan Kotan, İsmail Beşikçi...

Di 1966'an de peywendiya min digel Berzanî çêbû. Pişt re, di sala 1975'an de birêz Abdullah Öcalan jî dihat mala me û diçû; bi bîr û baweriya xwe ve,

bi kesîtiya xwe ve, durîst û rastbîn bû.

Gava ku qala serxwebûna Kurdistanê dibû, axî jî dilê wî dihat û ji wê rojê û vir de min bi çavekî Kurdistanxwaz lê nihêrt. Di wê demê de birêz Abdullah Öcalan jî rêxistîna xwe çêkir û li ser rîya xwe ya rast dimeşiya.

Di sala 1975'an de KDP bi hev ket û komek jê qetiya (KUK) û di sala 1979'an de xerabtir bû.

Heta KUKê êrişî me kir, hevalên me kuştin. Ew dem wisa derbas bû.

Di wê demê de min PKK'ê nêzîkî xwe didît û min KUK jî dûrî xwe didît. Di 1981'ê de ez ketim girtîgehê, lê di girtîgehê de me dixwest ku em bijîn, nemirîn.

Ez vekirî dibêjim, divê min li ber xwe bidaya ta mirinê. Dewleta tirk tiştên pis dikirin.

Di sala 1981'ê de her kes teslîm bû; berxwedan dijwar bû, zor bû, mirin bû. Dil dixwest ku min li ber xwe bidaya ta mirinê. Ez nerazibûna xwe tim û tim bi bîr tînim. Demeke nexweş bû.

Piştî girtîgehê, PKK'ê dest bi şer kir, hingê min piştgiyariya wan kir. KDP'ê belavokek belav kir, tê de nebaşiya PKK'ê digotin. Ez bi awayekî vekirî, li dijî KDP'ê derketim û min çewtiyên wan diyar kirin.

Pişt re ez hatim Swêdê, min dixwest ku tevgerekê çêkim û şerê çekdarî bidim destpêkirin, min bi gelek kesan re deng kir, lê tiştêkî çênebû.

Hin kesan ez wekî sekreterê KDP'ê dizanibûm. Ev tişt ne rast e. Giraniya min hebû, lê ez nebûm sekreterê KDP'ê.

HEVPEYVÎN:
MÂRÛF YILMAZ

TÎŞK

SÎRWAN REHÎM

Kamgarekan
û bawkiyan

Binemaley kamgarekan, le we derçûne ke wekû malbatêkî asayî temaşa bikrên û lew rwangeyewe helbisengênrên.. Ewan emro çemkêkî gewre û karîgerî mosîqay kurdîyan be destewe girtuwe û tewerêkî be bandorî ew mesele huneriyê pêkdênin.

Piranî kurdistanî gewre, be taybetîş dostanî mosîqay kurdî û ewaney ke bew mijarewe serqalin, dezanin ke em xêzane çîyan bo mosîqay kurdî kirduwe û çend zanistiyane destiyane bo hunerî mosîqa birduwe.

Diyare ewan, wata kamgarekan, be sud wergirtin le folklor û goranî ke le hunermendani pêşuman û be awêtekirdinî ew karane le gel hunerî serdem da, twanîwyane berhemî nayab û westayane bixene ser xwanî mosîqay kurdî.

Kê heye guhdarî berhemekani em girupe bikat û rohî Seyîd Elî Esxerî Kurdistanî û Elî Merdan be zînduyî nebinê, û hawkat mîzacî kurdewarî be hunerî xoşik û bedewî em hunermendane neyetewe cê.

Ke bas lem tipe huneriyêş dekrêt pêwîste rolî karîgerî bawkiyan le yad nekrêt, ke hunermendî koçkirdû Hesenî Kamgar e. Belê Hesenî Kamgar yekem mamosta û fêrkerîkîç û kurekanyetî, ew newekani xoy handa ke xo terxan biken bo xizmetî goranî û mosîqay kurdî.

Eger hunermende be twanakan carêk nemir bin, ewa Hesenî Kamgar dû car, çunke hem xoy le jîyan da xizmetî gewrey be hunerî mosîqay kurdî kird û hem dway xoşî ew kiç û kure dest rengînaney bo mosîqay kurdîman be cêhêşit.

Em hunermende azîze rojî 13.05.1992 le Taranî paytextî Îran koçî dwayî kird.

Le yadî Hesenî Kamgar da delêyin; Rewanî şad û ba carê me yade xêra ye wekû wefayek wabêt, ta barî le bartir û rawestani firawan le ser kare huneriyekani bawik û newekani em binemaleyê...

Kula ku kete êlê, wê were malê jî

Keçik çûne nav rezan, li hev dane tî-zan

Karê ne ji me re wekî bayê ser min re

Zik hate ber derî, hiş hatin serî
Ez bi qurbana herîrê bû pîne li hesîrê
Ez bûme eşika ferî, ne deşt hişt ne erdê berî

Lingê xwe bi cih kir, hîz (tuluk) kev-çî kir

Ê ber aran (agir), çûn ber diwaran hatin ber aran

Jinan weyne ji malan, xwarzê darin (diçin) li xalan

Ji dûr ve nagihîje (nagê) ber hûr (mî-de)

Pîrê bawer nekîr mêr bike, mêr kir îcar dawa heftekan dike

Tayê (takê) destarê bin disekine vê-ca yê ser nasekine

Filankes çû seferê, hat dîsa kerê be-rê

Bi xêra hevalan çû seyda (nêçîra) xezalan

Berxê çêl li ber kozê belî ye

Gur postê xwe navêje

Kûçikê har bi xwediyê xwe negire, ne meqbûl e

Rim nakeve tûran (rim di tûran de hilnayê)

Ji dûr ve niherî bi zêran kirî, kumik rakir serî gurî

Bejnê tîte konê (çadir) bêçit e

Çiya çiqas bilind be, wê rojekê rê pê bikeve

Çirayê tu mirovî, heta sibê vênakeve

Mîrîşk çiqas axê vede, wê tim bi se-rê xwe de bike

Siwarê rûtê sibê dereng dihere, êva-rê zûtê.

Pêlê birim ji tîna mirim

Av çiqas di golan de bimîne, genî dibe

Lanet li sîrê jî, li pîvazê jî were; her du jî bîn didin

Kevirê, havînê biavêje binê kulînê

Benîşt çiqas were cûtin bêhn dide

Dînan re bernekeve, koran kêç bi dest nekeve

Bike zehmet bixwe namet (nîmet)

Hima ku mirov bibêje şikir, ma de-vê mirovan şîrîn dibe

Peyê (zilam) bêar tim kurik e, jina bêar tim keçik e

Mar çiqas biçûk be, bêjahr nabe

Gotin "kî ko re?" Xerîbî kor e

Kî şemîtî ew şewîtî

Serê qeterek deve (hiştir), kerek (cehş) dikişîne

Ez çî dibêjim, saza min çî lédixe

(nêçîrvan) li xwe zêde dike

Çûçik bi çûçikatiya xwe gava avê vedixwe, li ser xwe re ji xwedê re şikir (spas) dike

Etar (çerçî) çî pê re be, wê difiroşe

Mala Xwedê ava be, qirik (qîjik) jî bi kevokê qayil nabe

Ga dimire, gagirok (soymaç) pir di-bin

Demeke gulana yeke sosinan e

Sîtilê got binê min zêr e, heskê got ji bin te tême

Akinciyê (çiftçi) bêrez, şivanê bêpez peyayê ku di civatê de bibêje ez, ji tiş-teki re nabe

Bila esil be, bila xwedan hesîr be

Çûçik digirin hev tîn, nav garisê me de li hev tîn

Bila rê be bila dûr be, bila qîz be bila kor be, bila bîr be bila bi av be, bila kûr be

Sêwî serbest in di bin destê ap û amojinan de radiwestin

Derê ar tune be, dûman jê ranabe

Mirov pîvazê nexwe, devê mirovan bênn nade

Xeta xwar tim ji gayê pîr e

Xwedê çiyê dibîne, berfê lê dibarîne

Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne

Bavê min ji xelkê re masiyan digire, ji me re kosiyân

Erd toxum înkâr nake

Bûkek anî ji heketo, qûna tu dibêji sepeto, xwer ji alî ve veketo

Bêar (bêşerm) avêtin kortê, gotin ra-bû dîsa benîştê xwe cût

Mirov yarê dayika xwe, çil rojî ji pêş xelkê dibihîze

Kera qoçê xwe tun in tim dibêjin em sîpe ne

Dilê şivanekî kete seriyek sergîn, heft salan bi xwe re gerand, paşê çande şîr û xwer

Çêdibe şûna xenceran, çênabe şûna xeberan

Bi pênc qurîşan kûçik qursand, bi deh qurîşan sabûn kirî serê xwe şuşt

Kêçê ket hêçê,

Aşê xwe li êş kir sûxreya xwe li qe-rêş kir

Ku nan ji nên şikest êdî hev û din nagire

Behr bi devê kûçikê heram nabe

Ji bajêr bê ji jinê re, ji kerê bikeve derd û bela xwe ji dê re

Ji Xwedê bihêztir tune ye, dîsa mafê kesî naxwe

Pîvaz çî sor çî gewr tûj e

Mala bûkê def û zirne, mala zavê hay jê tune

Dizan ji dizan dizî, erd û asîman tev lerizî

Ê kûçik nakeve qêlib

Li aliyekî def û dawet, li aliyekî şîr û girî

Mirov li welatê nenas kare bike pars

Min gû li rûyê mele kiro, nikaha ji-nê çê û xerab yek dibire

Ço û çîş, nan û tirş, av û qîrş

Mirov miriyan nebîne bi tayê rîza nabe

Zêr zane, zor zane, devê çikê mor zane

Neyne serê kesan, wê bê serê pisê pisan

Çûme diyarê Ferêto, ewrê reş baran bêto

Bi gulekî bihar nayê

Malxoyê min Omo, bihêvî herî li serê min komo

Gilgil ne tu arvan e, pê mal pê tê xapan e

Nan û mast taştêya rast, nan û dew taştêya derew

Keçik karan dikin bi şev de kebanîyan dihêlin di xew de

Baran dibare berf dihele, belekî erdê belî dike

Kula ku kete êlê, wê were malê jî

Gur kerê mirovan bixwe jê re namîne, lê mirov bêker dimîne

Xwedî kir bi nanê xwe, agir berda canê xwe

Ji pezê pir ma kavirê kur

Qaz wekî xwe dizane, baz wekî xwe dizane

REMZÎ QOLXANLI RUHA



Zêr bi ketina erdê namaşê

Ji weliyan xwelî, ji xweliyan weli çedibe (dikeve)

Xwedê got text bidim te, bext got tu bext bide min wê text bi xwe bê ber lingê min

Çi digerî li derê (cihê) kaş, ku tu bi-bînî xewnên şaş

Baran bariya bişevo, qelîştekan hatine hevo, yê me tenê man tev ji hevo

Xelk wê têne qertelê, qertel jî wê di çêlikê xwe ne

Qûna tirekan rûnane li ser berekan

Kurdî halê xwe wir dî

Kulav patin li hev hatin

Xal xelk e, ap milk e

Kebaniyê, toraqtirşê, rûngeniye

Kurmê darê ji darê nebe, dar nakeve

Ên xelkê ji serê çiyân tîn, ên me ji bin piyan tîn

Ji revê nagihîne lîxistinê

Gava ku ez bûme ax bila kes nebêje eywax

Zimanê xwe bigire, şûna xwe bikire

Nanê gilgil, ji tunebûnê çêtir e

Got çavê te kê derxist, got meriyê min; got lewra kûr derxistiye

Naxir ber ve mal bû, jina naxirçî bi kar bû

Eşikê tim ji xwe bi şikê

Riya malê malxo dizane

Bûkê ziman tune, xasî îman tune

Etaro rû ji malê saro

Kes nabêje dewê min tirş e, newalê min qîrs e

Xelk gî bûne kûçik, em tenê nebûne boçik (dûv)

Teyr ji hêlîna xwe difire

Xwîn bi xwînê nayê şuştin

Bûkek anî bi lezo, tê de ga û pezo, sivikê malê tim ezo

Bûkek anî şîlêrê, dest û lingê qilêrê, lingê min ji ber êr (agir) wêde kir ê, xwe da ber êran

Miriyo ji min mirîtiro, serê kerê ji min re bigiro

Bavê min ji xelkê re masiyan digire, ji me re kosiyân

Erd toxum înkâr nake

Bûkek anî ji heketo, qûna tu dibêji sepeto, xwer ji alî ve veketo

Bêar (bêşerm) avêtin kortê, gotin ra-bû dîsa benîştê xwe cût

Mirov yarê dayika xwe, çil rojî ji pêş xelkê dibihîze

Kera qoçê xwe tun in tim dibêjin em sîpe ne

Dilê şivanekî kete seriyek sergîn, heft salan bi xwe re gerand, paşê çande şîr û xwer

Çêdibe şûna xenceran, çênabe şûna xeberan

Bi pênc qurîşan kûçik qursand, bi deh qurîşan sabûn kirî serê xwe şuşt

Kêçê ket hêçê,

Aşê xwe li êş kir sûxreya xwe li qe-rêş kir

Ku nan ji nên şikest êdî hev û din nagire

Behr bi devê kûçikê heram nabe

Ji bajêr bê ji jinê re, ji kerê bikeve derd û bela xwe ji dê re

Ji Xwedê bihêztir tune ye, dîsa mafê kesî naxwe

Pîvaz çî sor çî gewr tûj e

Mala bûkê def û zirne, mala zavê hay jê tune

Dizan ji dizan dizî, erd û asîman tev lerizî

Ê kûçik nakeve qêlib

Li aliyekî def û dawet, li aliyekî şîr û girî

Mirov li welatê nenas kare bike pars

Min gû li rûyê mele kiro, nikaha ji-nê çê û xerab yek dibire

Ço û çîş, nan û tirş, av û qîrş

Mirov miriyan nebîne bi tayê rîza nabe

Zêr zane, zor zane, devê çikê mor zane

Neyne serê kesan, wê bê serê pisê pisan

Çûme diyarê Ferêto, ewrê reş baran bêto

Bi gulekî bihar nayê

Malxoyê min Omo, bihêvî herî li serê min komo

Gilgil ne tu arvan e, pê mal pê tê xapan e

Nan û mast taştêya rast, nan û dew taştêya derew

Keçik karan dikin bi şev de kebanîyan dihêlin di xew de

Baran dibare berf dihele, belekî erdê belî dike

Kula ku kete êlê, wê were malê jî

Gur kerê mirovan bixwe jê re namîne, lê mirov bêker dimîne

Xwedî kir bi nanê xwe, agir berda canê xwe

Ji pezê pir ma kavirê kur

Qaz wekî xwe dizane, baz wekî xwe dizane

Dar mirovahî û kulîlkên wê jî qewm in

Em kirvên hev, dost û cîranên hev, heval û navmalîyên hev bûn. Li Mezopotamyayê em bi hev re xemla darekê û kulîlkên wê bûn. Bi kurtasî, em tev şênahiya Bexçeyê Qewman bûn. Xêrnexwazan bagereke xurt û wêranker bi ser me de ajotin. Em ji hev de xistin û wan em kirin qisasên serê hev.

Sebebê ku ez dema borî bi kar tînim ji ev e: Dar wekî berê bi kulîlkên xwe têr naxemilîne. Ew ji hev xeydan in û dilê wan mîna berî li hev ronî nade. Baş e ku yên xwedî-hiş û zane hene di nav wan de. Îro her kes li dûşa xwe difetile; ji encaman bêhtir li ser sedeman radiweste û poşman in jî. Ji bo ku careke din di nav gelan de rûdanên sosret çênebin, gere mirov bide dû wan bûyeran û ji pirsra "Gelo kî bûn em berdan hev" re bersiveke qenc bibîne.

Ën ku di nav me de ewanî û berhev-danî kirin kî bûn...?

Pirtûka Surme Xanemê ev gotinên li jorê bi min dan gotin. Ev rahîbeya asûrî, ku di 27.01.1883'yan de li Culemêrgê, li Qudsanîsê hatiye dinyayê û di sala 1975'an de jî miriye. Wê bermahiyeke heja li dû xwe hiştiye. Bi vê berhemê Surme Xanemê xwestiye ku qewmê xwe, bi taybetî jî dab û nêrîtên (orf û adetên) gelê xwe, jiyana wan a civakî û dînî bi rojavahiyan bide naskirin.

Di destpêkê de rexneyek jî li rojavahiyan dike û gazinc ji zihniyeta wan dike ku ew der barê rojhilatîyan de pêş-

Îro her kes li dûşa xwe difetile; ji encaman bêhtir li ser sedeman radiweste. Ji bo ku careke din di nav gelan de rûdanên sosret çênebin, gere mirov ji pirsra "Gelo kî bûn em berdan hev" re, bersiveke qenc bibîne.

daraz in. Wiha dibêje: "Hûn rojavahî, bi pîranî, der barê me rojhilatîyan de wekî ku hûn her tiştî dizanîn me didarizînin."

Surma Xanem, wêneyekî ximam î zerhimî dide destê xwendevan. Wêneyekî ximam dibêjim, ji ber ku ew tenê dab û nêrîtên dorhêla xwe û bûyerên ku ew bi xwe jiyaye û dîtiye, vedibêje me. Qesta min a jî zerhimiyê jî ev e: Di dawîya pirtûkê de behsa têkiliyên kurd û asûriyan, asûrî û tirkên dike û pişt re jî li ser qewmînan ku di Şerê Cîhanê yê Pêşîn de çêbûne, disekine. Ew hin agahiyan li ser bûyerê dîrokî jî, ji me re dibêje. Nimûne; der barê bûyera di navbera asûrî û Berdirxan Begê Botî de jî tiştinan dadixuyîne. Lê ew li ser rola îngilîzan a di wê bûyerê de nasekine. Ê ku asûrî û kurdan li hev rakirin îngilîz bûn! Bi ya min divê bê zanîn.

Kuşîna Mar Şemûn bi destê Simko bi awayekî xinizî ku eceman pê dabû kirin, sosretek e. Hêzên serdest bi dek û dolabên bi vî awayî, neyartiyeye dîrokî dixine navbera gelên bindest jî. Bi vê şeweyê siyaseta "wan ji hev bike û pişt re jî idare bike" hatiye bikaranîn.

Em bi vê pirtûkê careke din hin dibin ku, împeryalistan li Rojhilatê jî bo


feyde û berjewendiyên xwe çawa cihê-rengiya civakan wekî dîn, mezheb, nijad û hwd. ji xwe re bi kar anîne.

Felaketeke mezin di vî şerî de hatiye serê gelê asûr, heta li Rojhilat xaç û hîvikê bi hev re şer kirine. Îngilîz, amerîkan, ermen, asûr li aliyekî û ecem, tirk (osmanî) û kurd jî li aliyekî...

Gerek e em bibêjin ku, beriya Şerê Cîhanê yê Pêşîn di navbera kurd û asûriyan de pevçûn û nexweşî, çî li Herêma Culemêrgê (Hekariyê) û çî jî li devêrên din, ku di nav hev de dijiyan, car caran qewimîne. Heta kurdên herêmê ji ber ku ew fileh bûne li wan tehde jî kirine.

Baş tê zanîn ku qelsîti her tim jî xurtîtiyê re kêma kişandîye û yê qels tim bi heqiyê girtine. Ev yek di nav geleki de, di nav êlan û di nav babistanan de jî wisa bûye. Ji lew re, em bi awayekî sosyolojîk gava li vî rewşê binêrîn, em dikarin navê bûyerên asayî (alêlade) lê bikin.

Piştî van daxuyaniyan, min divê ku ez îcar der barê pirtûkê de hin agahiyan din jî bidim. Pirtûk cara pêşîn di sala 1920'an de bi îngilîzî çap bûye: Assyrian Church Customs and the Murder of Mar Shimun. Weşanxaneya Nsibîn li




Swêdê, di 1993'yan de bi tirkî ew çap kiriye, bi navê "Doğu Asur Kilise Gelenekleri ve Patrik Mar Şamun'un Katli" (Adetên Dêra Asûra Rojhilat û Kuştina Patrik Mar Şemûn).

Weşanxaneya Avesta jî, cara sîsiyan ew weşand. Îcar Avesta bi rasemava "Ninova'nın Yakarışı (mirov dikare wiha li kurmanciyê wergerîne; Hawara Nînovayê). Ev pirtûk jî aliyê Meral Barış ve li tirkî hatiye wergerandin û 96 rûpel e.

ZANA FARQÎNÎ

Şaîrê kurd kî ye?

FIRAT CEWERÎ



Ev demek e di nava rûpelên kovar û rojnameyên kurdan de munaqeseya edebiyata kurdî û di edebiyatê de bikaranîna zimanê kurdî tê kirin. Ev tiştekî baş e, hêviyekê dide mirov. Lê belê çî bigire an hemû an jî pîraniya van munaqeseyan, bi tirkî dibin. Ev yeka han jî şaşiyek e; ji ber vî şaşiya ku bi şalan hatiye kirin, em îro nikarin bi kurdî binivîsîn, em berhemên xwe yê edebî bi tirkî didin. Ev berhemên ku bi tirkî tene dayîn malê kîjan zimanî ne, edebiyata kîjan zimanî ne û jî kîjan zimanî re xizmetê dikin? Mimkun e ev problema hanê ji bo zimanên serbixwe çareser bûbe, lê ji ber ku nasnava kurdan, di rewşa îro de bi zimanê wan ve girêdayî ye, bêşik divê edebiyata kurdî bi zimanê kurdî were dayîn. Ji bo min ziman, berî mijarê tê. Yanê mijara berhemeke edebî çî dibe bila bibe, ger ew berhem ne bi zimanê kurdî hati-be nivîsandin, ezê nikaribim wê tîxim kategoriya edebiyata kurdî. Ew berhem, berhemeke edebiyata tirkî ye. Ev ji bo hemû şaxên edebiyatê; roman, çîrok, helbest, piyes û hwd. yek e.

Ger mijar berî zimên bihata, meyê îro piyesa "Zimanê Çiya" ya Harold Pinter, romana "The Diplomat" ya James Aldridge, romana

"Hakari'de Bir Mevsim" ya Ferit Edgü û gelek berhemên bi vî awayî berhemên edebiyata kurdî bihesibanda. Em dizanin ku "The Diplomat" û "Zimanê Çiya", du berhemên edebiyata îngilîz in û "Hakari'de Bir Mevsim" jî berhemeke edebiyata tirkî ye. Yanê di vir de jî bo min miliyeta nivîskar ne muhîm e, ya muhîm zimanê ku nivîskar bi kar anîye. Ev nivîskar dikarin bi eslê xwe kurd bin jî, lê zimanê ku ew bi kar tînin ne bi kurdî be, ez nikarim wê berhemê mîna berhemeke edebiyata kurdî bihesibînim.

Mîna tê zanîn, li Tirkiyeyê bi sedan berhemên edebî jî aliyê kurdan ve bi tirkî hatine nivîsandin. Di edebiyata dîwanê de şaîrên wekî Nesîmî, Nabî, Fuzûlî; di destpêka tevgera Jon Tirkan de şaîrên rewşenbîrên mîna Abdullah Cewdet, Ziya Gökalp, berî û piştî cumhûriyetê Ahmed Haşim û hê derengtîr Ahmed Arif, Cemal Süreya, Kemal Burkay, Orhan Kotan, Hicri İlgören, Aydın Alp, Yılmaz Odabaşı; romanivîsên wekî Yaşar Kemal, çîroknivîs û romannivîsên wekî Esmâ Ocak, Seyit Alp û gelekên din.

Gava em listeyê dirêj bikin emê bikaribin bi hêsaniyê nêzîkî sed navî ji edebiyata tirkî hilbijêrin ku bi eslê xwe kurd in û bi tirkî nivîsandine. Lê mirov dikare van bike du kategoriya û kategoriya jê, kurdîtiya xwe înkâr dike, yek jê jî hem kurdîtiya xwe înkâr nake, hem jî bi profesyonelî siyasatvaniya kurdî dike. Lê bi ya min ji bo ku mirov berhemên wan ên edebî mîna berhemên kurdî bihesibîne, bi profesyonelî siyasat jî tîr nake.

Em dizanin ku Cemal Süreya yek ji şaîrên Tirkiyeyê yê herî baş e, kurd e, lê li kurdîtiyê

xwedî derneketiye. Ahmed Arif geh kurd bûye, geh jî tirk, lê belê ew jî şaîrêkî zimanê tirkî ye. Kemal Burkay û Orhan Kotan ku zêdeyî nivê emrê xwe di siyaseta kurdî de bihurandine jî, ez nikarim şîrên wan şîrên kurdî bihesibînim. Herçî Kemal Burkay e, ew niha bi kurdî dinivîsîne û cihekî şîrên wî yê qedirgîr di edebiyata kurdî de heye. Lê "Gülümse" ya ku Sezen Aksu distrê, ne şîreke bi zimanê kurdî ye. Her wiha şîrên Orhan Kotan îro jî aliyê Ahmed Kaya ve tene strandin. Herçî İlgören û Yılmaz Odabaşı ne, digel ku şaîrên baş in û li Tirkiyeyê xwediyên xelatan in jî, dîsan ezê nikaribim wan mîna şaîrên zimanê kurdî bihesibînim.

Ji ber ku ew şîran tirkî dinivîsîn û her wiha ew dikevin kategoriya edebiyata tirkî. Yanê di rewşa îro de, çî kurdên ku xwe înkâr dikin û çî jî kurdên ku ji bo kurd û Kurdistanê tîkoşînê didin, ger zimanê berhema wan a edebî bi tirkî be, ew nivîsarê zimanê tirkî ne.

Ji ber ku rola zimên di binavkirina berhemê de her tim girîng bûye, lewma em îro dikarin bi hêsaniyê navên hin şaîran bidin ku, tu şik di şaîrbûna wan a kurdî de tune ye. Zelalbûna vî pirsgrêkê jî bikaranîna wan a zimanê kurdî tê. Yanê her kes îro bi hêsaniyê dikare bibêje ku Ehmedê Xanî şaîrêkî kurd e. Ji ber ku Ehmedê Xanî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Her kes bi hêsaniyê dikare bibêje ku Melayê Cizîrî şaîrêkî kurd e, ji ber ku wî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Eynî tişt jî bo Feqiyê Teyran, Melayê Batêvî, Siyahpûş, Pertew Begê Hekarî, Hecî Qadirê Koyî, Cegerxwîn, Qedîrî Can, Osman Sebrî, Mehmed Emîn Bozarslan, Rojen Barnas, Malmîsanîjî jî derbas dibe.


Berçavka kirêt a dewleta tirk: INAF

Di çanda kurdî de cihekî taybet ji metelok û pêkenokan re heye. Mirovên kurd dema dest bi axaftinê dikin, gotinên xwe bi pêkenok û metelokan dixemilînin. Heke em jî li ser vê rêçê bimeşin, ev pêkenok wê baş xizmetî mijara vê nivîsê bike: "Rojekê xortekî nûhatî genimê xwe li kera xwe bar dike û dibe êş; li vegeerê niyeta xwe li kerê xerab dike, lê bejna wî rê nade ku bigihîje mebesta xwe, lewre jî hildikişê ser tehtekî. Tevî vê yekê jî bi ser nakeve, di ser de jî lingê wî dişemite ew li ser qûnê li erdê dikeve. Xortê me kor poşman vedigere malê.

Lê ew rihet nasekine, dixwaze vê serpêhatiya xwe wekî ku hatibe serê meleyekî vebêje û wiha dest pê dike:

–Dema ez ji êş vedigerim, min di rê de meleyê filan gundî dît, wî niyeta xwe li kerê xerab kiribû, lê ji ber ku bejna wî kinik bû hilkişibû ser tehtekî. Min dît ji nişka ve lingên wî şemîti û li ser qûnê ez ketim.

Gelek caran hêzên dewleta tirk jî dixwazin sûcên xwe bikin pêşa PKK'ê, li ser navê wê nameyên tehdîtkar dinivîsin, ji xelkê bertil û xeracan dixwazin. Hin caran ji bo ku mirovan ji gerîla dûr bixin, an jî gel bikin ceş, belavokan belav dikin, li ser navê PKK'ê



Heta hin caran Serxwebûnên sexte çap dikin û ji mirovên welatparêz re dişînin. Hin caran bi zanatî, hin caran jî bi xeşimî bi berçavka dewletê şiroveyan dikin li ser navê PKK'ê, pîrî caran lingê wan dişemite, li ser qûnê dikevin erdê, lewma jî sûcê wan êşkere dibe. Mesele di belavokekê de ku hêzên tirk li herêma Antakyayê li ser navê ERNK'ê belav kiribû, sloganeke bi vî rengî hebû "Ardekevi Türkiye". Heke ev slogan bi ber şûrê redaksiyona Azadiya Welat biketa, wê bi vî awayî bûya: "Tu di erdê kevî Türkiye." Her çiqas ji aliyê wateyê

ve tu îtiraza me ji sloganê re tune be jî, di literatura PKK'yîyan de sloganeke bi vî rengî hê nehatiye bikaranîn.

Van rojan navendeke nûhatî, wekî "xortî nawbiraw" bela xwe ji saziyên kurdan venake. Ev saziya ku nûçeyên wê bi riya AA'yê belav dibin, Navenda Lêkolîna Têkiliyên Navneteweyî yanê INAF e. Navenda vê saziyê jî wekî navenda kontraya tirk li bakurê Kibrisê ye. Ev navend rojekê li ser MED-TV, roja din li ser PKK'ê nûçeyên pekandî çêdike û pêşkêşî reyîngehê tirkan dike. Li gorî nûçeya dawîn a vê navenda nû-

hatî, Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, 140 kadroyên xwe yê sereke ku li hemberî artêşa tirk betilî ne, ji bo bêhnvedanê şandine başûrê Kibrisê. Nivîskarê/a vê nûçeyê an ji nezanî, an jî bi zanatî ji çavên xwe berçavka xwe ya kirêt dernexistiye. Her wiha dema mirov nûçeyê dixwîne, jê dêrdixe ku mêrik, an jî jinikê ji serpêhatiyan "artêşa herî mezin a herêma" sûd wergirtiye; qet nebe leşkerê ku li bakurê Kibrisê dest avêt jinekê, mêrê wê jî kuşt, an jî "şevên moralê" ku jê re dibêjin "Aç aç gecesi" di ber çavên xwe re derbas kirine.

Binêrin, wekî ku kurdên Başûr dibêjin: "Kurî bêbaw, an jî kiçî bêbaw çi delê" li gorî vê nûçeyê "140 kadroyên PKK'ê bi gemiyan tîna Limasolê, li wir li malên bêhnvedanê belav dibin ji bo ku zêde balê nekişînin. Paşê jî diçin li meyxaneyan serxweş dibin, pevçûnan derdixin, dest diavêjin jinan, lê rayedarên Kibrisê li hemberî vê yekê bêdeng dimînin."

Saziya nûhatî, bi berçavka ku li bûyeran dinihêre, xwe dide dest, ango li ser qûnê dikeve erdê, lê dîsa jî dibêje: "Yê ku bûyer pêk anî mela bû."

SAMÎ TAN

XELAT...

1	P	S	A	E	Z	
2	D	N	Z	G	Z	M
3	R	A	V	E	Y	E
4	N	E	A	R	A	F
5	S	A	N	I	Y	E
6	R	T	L	L	L	A
7	G	T	Z	E	R	F
8	B	E	K	O	A	I
9	H	A	N	G	R	E
10	G	R	A	D	E	S

Bersiva Xaçepirsê (17)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 19'an kitêba **Gabar Çiyan "Tarihte Kürd Sürgünleri"** ye. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn "Peşya Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.




Kesên ku xelata xaçepirsa 17'an, kasetaya **Kardeş Türküler** qezenc kirine: **İbrahim Botani/Yüreğir**, **Hêlîn Kubilay/Buca**, **Mahmut Çetinkaya/Adana**, **Ferhat Aycan/İstanbul**, **Bedir Zinar/Adana**, **Münir Döğër/Diyarbakır**, **Züheyla Turan/İzmir**, **Özgür Tüzün/Bartın**, **İsmet Korur/Urfa**, **Haydar Özkan/Ankara**


XAÇEPIRSA BIXELAT (19)

Bilindahi	Hakim Kurdzane ki biyan (wêne)	Gihanek	2	Gilî sitem	6	Cemiyet		Cahil
Fikir		Cilwe				Baneşanek		
				Bidonên petrolê				
Nimûne vekok Hidrojen				Gom				
	Ne dūr Zimanê japonan			Serab				
Ban				Raweya fermani Emaret	7	Cinavkek		
Qels zeyif		8	Paytexta Filipinê	3		Sembola iridumê		
		Çav				Li Ewrûpayê robarek Fermanek ji bo çünê		
Partiyeke kurdan		Xwendina tîpekê		Damar				
Xulamî				Baxê tiri				
		4			Ya, yan			
Neteweyên Yekbûyî (kin) Bêav				Çerçî	5			
		Metod						



PEYVA VEŞARÎ





Dewê mi nika rismû de mende

Dewê ma verê coy zof rindeç bî. Ma ra qorê dîna de cayê en rindeç dewê ma bî. Wesar eke amêne, vovr vilosiyênê ro, ûwe kotêne derû, derêy çemû de restêne pê, biyenê hîra şiyênê.

Vore ver dera dewû de vînoşiyêne ro. Kow ra tenêna herêy şiyêne. Tayê cav de wesar vêrdêne ra amnan amêne hona vora biye. Wertê amnanî de je koyê sulvîş, je koyê baxire, koyê jêle cawina berzû ra vore mendê ne.

Dew de Wesar ra piya pira pir weş royêne, hew jiye her ca guretêne gayan û kawran kerdêne tever, berdêne çiraynêne. Wesar ra piya esku çêfê (kêf) mîletê ma biyêne jêde. Çike şeş aşmî her çî binê vorê de mendêne.

Zimistanî hûnde kar çînê bî, Wesar kar biyêne jêde. Her çê de karê pêrînan kerdêne vila. Karê her kes belî beno. Çiraynayena mal û gaw dene doman û xort o. Pîl û çî karê xo werte xo de barê kerdêne. Camerdû rençberîye kerdêne, cênî karê zerî kerdêne. Cenî perîn ra jêde gurê êne.

Wesar eki wêdêne ra kow ra pira pira vovr vilosiyêne ro, na rayek bar kerdêne, şiyene warû. Warey pero ber ra bineniya kow ra bî. Warey zof şen bî. Cenî karê xo dene arê amêne tê lewe zuwîn de qesey ker-

Rozê tifone ontî ra çêverûne dew û va ki: "Îta ra şerê ne."

Vanê: "Şima ya tiya ra şirê, yan jî mirenê." Mîletê ma xo rê xo pers keno: "Nê çira ma kenê tever? Çira ma surgin kenê? Ma ra çi wazenê?"

dêne, klamî vatêne, zûwîn de karaniye kerdêne. Domanê çî verê warî de kay kerdêne.

Xort û tayîne çî destên kerdêne. Sodrî dewû ra do kerdêne rewke, estêne turik, most kerdêne qizik ware ra ardêne dewe. Dewe de her sodrî dow mosto teze weriyene. Deştî sodrî şiyêne dewe sondir tepiya amêne ware. Rojî niya wêrdene ra nejdiye payjî tepiya bar kerdêne amêne dew.

Dewî de mîletî mal û gay kerdêne weyî ye. Weykerdena mal û gayî zof çetin bî. Çike şeş aşmî her çî bine worê de mendêne. Na şeş aşmî mal gaw re waş û simer lozim bî. Na waş û simer gerek e erê zimistonî hazir biyêne. Wexte waş mîletî zûvî de gerxat kerdêne. Nayeke turpane çinenê, perîne her roz waşê zû çeyî çinitêne. Honake wext nêvêrdora waşê dewê pero qen nêne.

Zimistonî ra piya wore her ca guretêne,

her ca biyene sîs. Zimistonî bar senik bî, çêfê mîlet amêne hurendî. Şewê zimistonî deng bî. Na şewûnê dengû de mîlet her şew zû çê de biyene kom. Klamî vatêne, saniçi vatêne. Cen û camerd û pîl û qizi doman re vatêne doman û gostene.

Niya rojî aşm û aşmî serû de biyêne pir. Mîletê ma eşq û çêfê (kêf) xo de bî. Na eşq û çêf (kêf) niya nêmend.

Rozê tifone ontî ra çêverûne dew û va ki: "Îta ra şerê ne." Vanê: "Şima ya tiya ra şirê, yan jî mirenê." Mîletê ma xo rê xo pers keno: "Nê çira ma kenê tever? Çira ma surgin kenê? Ma ra çi wazenê?"

Mîletê ma çiya nanên ra misayi bî. Çike pî û kalikunê maç rê niya kerdîvî surgîn, çistenê (kiştênê), qirkerdenê pero pî û kalikunê mareç kerdîvî.

Nika jî na rayê je vîran nebî. Na rayê mal û gayîş pero qirkerdenê. Dewî wêşnênê, zulmê nînan kes nedîvî. Na rayê îsonetiye çîstêne, îsonetiye kerdêne windî. Dewî pêro bin ra, darî wî weşnayî, kes nemend. Dewê ke weşnayî zû dewê ma nêbî. Jê dewine ma di hozor dewê binî wêşnayî.

Nika ki dewe yêne çimanê mi ver. Wazenê ke şerî kewi xo, besenekenî şerî. Çike dewa mi nika hurendî de çîna, dewa mi rismû de mende.

BÜLENT BORAL

Divê hin deng, bi awayekî din bên nivîsandin

Dibe ku yên ji me xwendevanan pêşkêştîr jî hebin û karibin li ser rêzimanê kurdî biaxivin û mafê wan jî heye ku pêşniyaz û rexneyan li rêzimanê xwe bikin. Di vê pevejoya pêkhatina alfabe ya kurdî de, feydeya van yekan heye.

Di zimanê kurdî yê nivîskî de, hin kêmasî hene. Ev kêmasî divê rojek berî rojekê jî holê bên rakirin. Ew kêmasî di konferansa zimanê kurdî ku di sala 1995'an de li Ewropayê çêbûbû, hin zimanzanan derxistin holê. Lê belê biryareke fermî nehate standin. Ji van kêmasiyan hin mînak ev in:

Di zimanê kurdî de hin deng hene ku bi tipeke din tîn îfadekirin. Mînak:

P: Par (çûyî), par (pay)

Ç: Çar (potik), çar (hejmara çaran)

T: Tûr (tûrê nên), tor (tora masî)

K: Kew (kewê ribat), kew (kewandina birî-nê).

R: Ter (dara şil), ter (qet)

Van mînakan mirov dikare zêde bike. Wekî di konferansê de jî hate zimên, tîpên 'p, ç, t, k' mirov dikare tîpa 'h'yê deyne pêşiya wan. Mînak:

Par: (Çûyî), phar (pay),

Çar: Çhar (potik)

Tûr: (Tûrê nên), thor (tora masî).

Kew: (Kewê ribat), khewa (kewîna birîne)

Tîpa 'r'yê jî divê ya hişk bi du hebên li ber hev bê nivîsandin. Mînak:

Têr: (Nebirçî), têrr (heybe).

Ev kêmasî girîng in. Divê bi biryareke fermî bêne rastkirin. PKDW jî dikare vê yekê pêk bîne. Divê ev yek zûtir çareser bibe. Ji ber ku pîrşîrêkên wiha di destpêkê de jî holê bên rakirin ango çareser bibin, baştir e. Heke neyên çareserkerin, wê di zimanê kurdî de tevlihevî çêbe. Niha jî ev astengî xuya ye.

ÇIYA MAZÎ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
293 53 19 - 251 90 13

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Nimîndeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Berlin: Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Atîna: Ferhan Zêbarî
30-13634905

Bruksel: Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm
Robin Rewşen
46-8-7510564

Badenwürttemberg
A. Rahim Ayaz
49 75 45 91 10 42

Bonn: Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda: Remzi İlhan
312 06 32 31 28

Malbatên windabûyan Dev ji dewletê bernadin

Malbatên windabûyan hêvî dikirin ku di navbera rojên 17-19'ê gulanê de komcivînekê di rewşeke asayî de pêk bînin. Lê hêzên dewleta ku ji bo HABÎTAT'ê ser û binê Stenbolê qul dike, bi segên hêvotî û panzeran hatin pergîniya wan û dan zanîn ku Waliyê Stenbolê komcivîn qedexe kiriye. Malbatan dîsa jî serî netewandin, komcivîna xwe pêk anîn, biryarên girîng girtin.

Zalim û neheq ne bi tenê li ser erdê welatê me, li seranserê cihanê şerekî kirêt didin meşandin. Ev rastî bi komcivîna malbatên windabûyan bi awayekî zelal diyar bû. Ji Şiliyê heta Filistinê, heta Ûrûgûyê mirov beşdarî vê komcivîna navneteweyî bûn.

Malbatên windabûyên di binçav de tevdira komcivîneke sêrojî kiribûn. Hêvî dikirin ku di navbera rojên 17-19'ê gulanê de komcivînekê li kampusa ÎTÛ'yê Anfiya G'yê di rewşeke asayî de pêk bînin. Lê hêzên dewleta ku ji bo HABÎTAT'ê ser û binê Stenbolê qul dike, bi segên hêvotî û panzeran hatin pergîniya amadekar û beşdarên vê komcivînekê; dan zanîn ku Waliyê Stenbolê komcivîn qedexe kiriye.

Dema malbatan heyetek şandin ba walî, ew ne li cihê xwe bû. Cîgirê Walî Osman Demir jî îdia kir ku haya wî ji tişteki nîn e û ew ne muhatab e. Heyetê diyar kir ku ew li muhatabekî/ê digerin ku pirsên xwe binin zimên. Dema jî heyetê mewanekî alman got: "Heta em muhatabekî/ê nebînin, ez jî vir naçim" Osman Demir got: "Xuya ye ji ber çî destûr nedane wê" û rîya derî nişanî wan da.

Li hemberî vê helwesta hêzên dewletê, amadekarên komcivînekê serî netewandin, lewma jî polîsan li Altuyola Kadiköyê êrîş birin ser mirovên ku dixwestin ji bo windabûyan fîndan vêxin, 21 kes girtin binçav. Di nav kesên ku hatin binçavkirin de du mewanên biyan, serokê ÎHD'ya Dîlûkê, Stranbêj İlkey Akkaya û hwd. hebûn. Du mewanên biyan paşê hatin dersînorkirin.

Komcivîn rojên 17-18'ê gulanê li navenda çandê, MED-KOM'ê çêbû. Gelek mirovên xwecihî û biyan dîtînen xwe pêşkêşî komcivînekê kirin û li ser vê mijarê pêşniyazên xwe anîn zimên. Wekî nimûne, Xalid Şahrûyê ku li ser navê Eniya Demokratîk a Filistinê beşdar bûbû, xwest ku malbat mijarê bibin Dadgeha Laheyê. Dîsa Şahrû pêşniyaz kir ku imze bîn berhevkerin û pêşkêşî saziyên navneteweyî bibin.

Nûnera ji Ûrûgûyê li ser dîroka çalakiyên ji bo windabûyan û tarîfa windabûyan rawestiya. Wê da zanîn ku, ancax ji mirovên ku bi destê hêzên dewletê di binçav de hatine windakirin re mirov dikare bibêje windabûyî. Wê diyar kir ku li Washingtona Amerika-



yê di 6'ê pûspera 1994'an Komcivîna Windabûyan hatiye li dar xistin. Ev rêdana li ser windabûyan li wir hatiye pejirandin. Her wiha Rêxistina Efüyê jî ev yek qebûl kiriye. Nûnera Ûrûgûyê bi bir xist ku ew li Amerikaya Latîn 17'ê gulanê wekî roja Lêpirsîna Windabûyan bi bir tinin, wê xwest ku ev tişt li seranserê cihanê pêk were.

Bavê Hasan Ocak, Baba Ocak bi axaftineke kurt, rûyê rastîn ê sîcdaran êşkere kir, wî got: "Ev dewlet a zordest û dizan e, ne ya mirovên kedkar e, lewma jî hêzên wê bi seg û panzeran, rê li ber civîna me digirin."

Li Amedê 500 heb windabûyî

Pîreka Ali Tekdağ, Hatice Tekdağê da zanîn ku sîcdar karê xwe gelekî bi zanatî dikin, mirovên ku winda bikin bi baldarî dineqînin. Hatice Tekdağê diyar kir ku ew ne tenê li ser navê xwe diaxive, her wiha jî li ser navê malbatên 500 heb windabûyên Amedê dipeyive. Ji ber ku rewşa aborî rê nedaye, bi tenê 4 kes hatine komcivînekê. Tekdağê da zanîn ku hêzên dewletê 18 caran mêrê wê girtine, lê îşkenceyên hov kirine, lê nikaribûne ajantiyê pê bidin pejirandin, lewma jî birine winda kirine. Hatice Tekdağê got: "Heta ew cenazeyê mêrê min, heke cenaze şewitandibin xweliya wî, nedin, ez dev ji wan bernadim."

Bavê Ihsan Engülê ku di 1978'an de hatiye windakirin, Hasan Engül, xwest ku mirovên pêşverû xwe perwerde bikin, rêxistinên xwe çêbikin, ji bo ku karibin pirsgirêkên xwe çareser bikin û doza xwe pêk bînin. Li aliyê din wekî Hatice Tekdağê pîreka Talat

Türkoglu, Hesena Türkoglu'yê jî da zanîn ku sîcdar bi baldarî qurbanên xwe dineqînin. Ji ber ku mêrê wê tu car serî li ber îşkencevanan netewandiye. Wê got ku hejmara mirovên pêşverû zêde dibe, lewre jî hêzên zordest ditirsin û dest diavêjin kirinên bi vî rengî.

Ji bilî van, di nav du rojên komcivînekê de gelek kesên wekî Abdulrezak İpek, Kadriye Tanrıverdi, Ferhat Tunç, rêxistinên wekî AGİF, GİK-DER, AC-TİT'ê axaftin kirin û pêşniyazên xwe anîn zimên. Dîsa Micheal Feeneyê ku li ser navê Projeya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KHRP) beşdar bû, xwest ku dewlet bi erênî bersivê bide agirbesta PKK'ê. Her wiha gelek kesên wekî keça Salvador Allende Isabella Allende, Henri Alleg, Komeleya Malbatên Girtiyên Herêma Baskê û hwd. bi mesajên xwe piştgirîya xwe ji bo komcivînekê nişan dan.

Ji komcivînekê ev encam derket

Divê bi beşdariya nûnerên ji welatên cur bi cur komîteyê li dijî windabûnên di binçav de saz bibe; divê navend û şaxên vê komîteyê hebin; komîte ji 20 kesan pêk were û di nav de nûnerên Rêxistina Efüyê jî hebin. Her wiha jî bo lêpirsîna windabûyan û têkoşîna li dijî windakirina di binçav de 17-31'ê gulanê wê bibe Heftiyê Navneteweyî ya Windabûyên Cihanê; wê êdî her sal komcivînekê li ser vê mijarê pêk werin; komîteya pêkhatî wê jî bo dengvedana mijarê serî li saziyên navneteweyî biçe û çalakiyên cur bi cur çêbibe. Komcivîn roja 19'ê gulanê bi serdana gora Hasan Ocak û Rıdvan Karakoç qediya.

S. BERBEYAN